# *Xewnên Biêş*

Ji Weşanên Komîteya Wêje Ya Rojavayê Kurdistanê

Xewnên Biêş

Berhevkirin: Botan Hoşê - Narîman Evdikê

Redekte: Botan Hoşê
Mîzanpaj û Bergê pirtûkê: Ebdulxenî Elî
Weşanxana Şilêr 2018
Wêşanên Wêje / 12
weje.vejin@gmail.com
weshanashiler@gmail.com

# Naverok


Pêşgotin.......................................................................7

**Nasnameya Min.............................................................9**

Bavê Min.......................................................................15

Dayîka Min ...................................................................17

Birayê Min Dirêhî Navê Tevgerî Deyax ...............................21

Birayê Min Mêhdî—Dilovan...............................................27

Dewamkirina Jiyana Malbatê ............................................31

Naskirina Malbatê ji PKK`ê re ..........................................33

**Jiyana Min .................................................................35**

Min Serê Xwe Şkenand ....................................................41

Em Çûn Ber Berxan.........................................................43

Karika Minî Delalî ............................................................45

Dara Tûwa.......................................................................47

**Di Sala 1985`an de Min Partî Nas Kir.............................55**

Jiyana Min Bi Serokatî Re .................................................63

Xwarina Me bi Serokatî re..................................................65

Xewa Me.........................................................................67

Serokatî Û Xweza ............................................................69

Bernameya Me di Malê de..................................................71

Bernameya Me ji bo Paqijkirina Malê,

Bexçe û Mitbexê. .............................................................73

Em Li Nav Bexçe Bûn .......................................................75

Berî Serok Here.................................................................77

Serokatî Xatir Xwestin.......................................................79

**Em Çûn Nav Kar ............................................................ 81**
Ez Çûm Kobanê ........................................................................ 85
Girtina Min Û Jiyana Zindanê .................................................. 87
Ez Li Qampê Bûm ..................................................................... 91
Ez Û Heval Nafiya Xwarinpêj Bûn ............................................ 95
Ez Nobetçî Bûm ........................................................................ 97
Encama Perwerda Me ............................................................... 99
Gurûpên Çûn Çiyê .................................................................. 101
**Gurûpa Me Çû Çiyê ................................................................ 103**
Gurûpa Me Bi Rê Ket .............................................................. 107
Ez Li Çiyê Bûm ....................................................................... 109
Di Jiyna Min De Ew Xwesteka Min Bû .................................. 111
Ez Çûm Zaxrosê ..................................................................... 115
Dola Deriyê Hirçê ................................................................... 117
Ez Çûm Herkê ......................................................................... 119
Ez Li Çarçêla Bûm .................................................................. 123
Di 1999`an Ez Çûm Cîlo ......................................................... 127
Piştî Sê Rojan Me Qampa Xwe Berda ..................................... 129
Em Li Geliyê Zapê Bûn ........................................................... 131
Ez li Çarçêla bûm .................................................................... 137
Derketina Ji Zaxrosê Û Çûn Xinêrê ........................................ 139
Xewna Şevê û Bîranînên Li Çiyê ............................................. 143
Ez Li Xinêrê Li Pajkê Bûm ...................................................... 143
Ji Perwerdeya Kadroyê Ez Çûm Qerargehê ............................. 145
Çûna Qendîlê .......................................................................... 147
**Ez Hatim Rojavayê Kurdistanê .............................................. 149**

Vegera Min Li Çiyê ........................................................... 153
Cara Duwem Ez Vegeriyam Rojava.................................... 155
Bi Kurtasî Ş. Dîrok Li Ser jiyana
Xwe Bi Rêz Kiriye............................................................. 157
Gotinên Ş. Dîrok Yên Dawiyê Berî
Şehadetê Bi Hefteyekê........................................................ 159
Gotina Ş. Dîrok Ji Bo Xwendevana.................................... 161
Ez Kîm e ............................................................................ 163
Welatê Min......................................................................... 165
Şehîd Dilovan..................................................................... 166

## Pêşgotin

Em di nav bîranîn yan jî bîranîn di nava me de jiyan dikin?

Dema ku bîranîn tên nivisîn, wê demê em û bîranîn bi hev re jiyan dikin. bîranînên ku hêjayî bin tên nivîsîn, mîna jiyana Ş. Dîrok.

Dema ev nivîs giha ber destên me, ez pir pê bandor bûm ji ber ji xeta destê wê xuya dikir ku çiqas zor û zehmetî kişandiye heta bi dawî kiriye û nivîsna bîranînên kadroyeke weke wê barekî giran bû.

Ev bîranîn, bi êşeke pir dijwar hatiye nivisandin, ne tenê beden dêşiya, dema ku mêjî û wijdan û pê re dil, hest û heta pênûs û lênûs jî bêşin mirov pir zoriyê dikişîne û ji ber ku kerameta wê ji êşê mezintir bû, hêsiran qebûl nadikirin ku dakevin.

Ev bîranîn di sala ku ji bo nexweşiya xwe ji kar hatibû sekinandin nivisandiye. Nivîs bêhinfirehiya wênî bi tenê bû û tim bi mêjiyê xwe re di şer de bû ku çawa ew bîranîn nayên bîra wê, ne bes e beden pê re xayîn derket, bîrgeh jî di rêya xiyanetê re diçû.

Ş. Dîrok zêdetirî heşt salan bi hêzeke mezin di kêferatê de jiyan dikir û tu carî nexweşiya xwe nedida xuyanêkirin, tevî ku pir li mal û deveran dima, lê qet xwe ji gel û malbatan cuda nedikir, tevî ku gelek kar yan xwarin û tişt jê re ne baş bû, lê berxwedana wê ji her tiştî mezintir bû.

Ş. Dîrok qet xwe ji karê partiyê nedida alî û bi hemû hêz û wijdanî kar dikir û qet carekê behsa nexweşiya xwe nedikir.

Ş. Dîrok ev pirtûk bi şêwazeke sade û pir rehet nivisandiye,

dibe ku di hin milan de hest pêwîst bûn nehatiye nivisandin, ji ber ku ew bi xwe jineke bêdeng û sade bû û tu carî tişt asê nedikir yan jî hestên êşê ji hemû hestên din mezintir didît, ji ber vê yekê wê tu hestên xwe neda pêş

Ev pirtûk di carekê de nivisandiye û lê venegeriya ye, dibe ku mercên wê ne alîkar bûn û dibe ku jî hew ev pê re derket û tenê ev derfet bû.

Jixwe ji dilnizmiya xwe wê behsa karên xwe nekiriye, tevî ku wê karên rêveberiya jin li pir bajar û deveran meşandiye û bandoreke mezin li ser milet kiribû.

Jineke weke wê bi ked, fikir, zanebûn û bi  tevlîbûnên xwe wê tim xwe ji aliyên fikirî de kêm didît û xwestekên wê ji bo perwerde û zanebûnê hebûn, perwerde û xebat her di dilê wê de hisret ma, lê ew weke hêzekê di nav gel û hevalên xwe de ma. Çûna çiyê ya duwem û gelek xebatên wê di wê rewşê de çêbû, ji ber vê yekê jî partî pir qêmîşî wê nedikir, lê ew tim bi israr bû û tu carî ji soz û ji xeta şehîdan venegeriya û xebata xwe berdewam  kir.

Ş. Dîrok li nexweşxaneya Şamê oxira xwe bi dawî kir û li du xwe ev nivîs ji me re weke hêzekê hişt, da ku em bê moral nemînin.

Di dawiyê de em jî dixwazin bîranînên jineke kedkar û can biêş bi we re par ve bikin.

**Silav û Rêz**

**Botan Hoşê**

**8.6.218**

# Nasnameya Min



Navê min yê rastî Şêxa Mihemed e.

Navê min yê tevgerî Dîrok Dilovan e.

Ez ji gundê Til Xenzîr im, gundê me girêdayî Amûdê ye, ez di sala 1970`î de hatime dinê, navê bavê min Ebdilqadir Mihemed e, navê dayîka min Merdiya Hisên e, min mehwe omiyê salekê xwendiye û bawernameya refa şeşan girtiye û min quran jî xwendiye. Ez fêrî zimanê kurdî bûme, ez bi her du zimanan dixwînim û dinivisînim.

Min di sala 1985`an de PKK`ê nas kir û di sala 1988`an de min biryara xwe da ku tevlî partî bibim.

**Silav û Rêz Dîrok Dilovan**

Gund û navçeyên Amûdê dibin bandora fewdaltiyê de jiyan dikirin û bandora pergala islamê di navçê de hebû. Di navçe û gundan de berê hinek axa hebû, beşek ji milet di bin bandora wan de bûn, bi guhertinên di navçeyê de çêbûn hêdî hêdî ev tîşt ji holê rabûn û bandora wan jî li ser milet rabû. Di demên borî de miletê di navçeyê ji bo xwe û zarokên xwe xwedî bikin bi karê paliyê, cot, çandinî û xwedîkirina sewalan mijûl dibûn, bi şev û roj dixebitîn û xwe xwedî dikirin, dema hin guhertin û pêşketinên di aliyê teknîkî de çêbûn. êdî piraniya karên xwe bi hesin dikirin wekî dirase, terektor, tirimbêl û hwd. Heta niha jî bi vî karî mijûl dibin ji ber cuda tu kar ji kurdan re tune ye, malbata min jî bi van karan re mijûl dibûn û xwe xwedî dikirin.

Malbata min ji qata ortê ye, dibin bandora ola islamê de mezin bûne. Malbateke welatparêz in, têkiliyên wan ên civakî fireh û vekirî ne. Pirsgirêkên wan di aliyê têkiliyên civakî de nîn in. Malbatek pir hestiyar in û pir bi hev ve girêdayî ne. Malbateke karker in bi keda xwe jiyan dikin û xwe bi rê ve dibin.

Bavê min di jiyan xwe de sê jin anîne, Fincê û Rifha me her du dayîk ew nedîtine, beriya dayîka min bîne ew her du miribûn piştî mirina wan bavê min û dayîka min zewicîn, di wê demê de temenê dayîka min pir biçûk bû, lê temenê bavê min pir mezin bû. Ji dayîka min Rifha zarok tune bûn, ji dayîka min Fincê sê zarok hebûn. Bavê min û dayîka min û ew her sê zarok bi hev re jiyan dikirin, dayîka min bi temenê xwe biçûk bû wan bi hev re wekî dayîk û zarokên xwe jiyan dikirin. Du xuşk û birayekî min ji dayîka min Fincê hebûn, ji dayîka min Merdiya em heşt zarok çêbûn, dayîka min ji wan pir hez dikir û wan jî ji dayîka min hez

dikirin. Piştî demekê xuşka min Ezîza ji nişka ve mir, temenê wê 19 salî bû di pey wê re dayîka min tim nexweş bû. Xuşka min Terfa em xwedî û mezin kirin, wê ji me pir hez dikir me jî jê hez dikir û me jê re digot mama. Bi zorê tê bîra min wexta ew zewcî ji birayê min hecî re kirin berdêlî. Wê demê birayê min mala xwe bir Hesekê, piştî demek derbas bû xuşka min Terfa jî mala xwe bir Şamê, wê demê ez zarok bûm bi zor tê bîra min ji şamê dihat cem me mêvandarî. Piştî demek derbas bû xuşka min a mezin Fincê ji tiyê xwe re xwest, wê û bavê min pir ber hev dan bavê min digot min te da wê malbatê ez keça xwe ya din nadim ew jî merivên mebûn, Terfa bi zanebûna aqilê xwe bav û diya min razî kirin û xuşka xwe bir ji tiyê xwe re û got bera em her du xuşk di malekê de bi hev re jiyan bikin. Demeke dirêj di ser wan re derbas nebû û di hundirê malekê de bi hev şa nebûn. Xuşka min Terfa ducanî bû, demek derbas bûbû zarok jê re çêbûn û paşê ya textor bû sedem û gurava xwe pêk nanî ew xuşka min jî mir. Dayîka min xwe amade kiribû û çûbû Hesekê wê çûba Şamê cem wê ji nişka ve cenazê wê anîn mala me, wê demê di nav malbat û merivên me de diniya xera bû, bandoreke mezin li ser me kir di serî de dayîk û bavê min pir êşiyan, dayîka min nexweş ket û heta niha jî ew ji bîr nekiriye û wê ji bîr nake jî û du zarok ji wê jî man, xuşka min Fincê ew xwedî û mezin kirin, ne di nav malbatê û ne di nav eşîra me de jineke wekî wê hebû û ne wê bijî, jineke henûn û bi aqilê xwe xweşik bû di ramanên xwe û kesiyeta xwe de pir bi bandor bû ji her kesî re xuşk û dayîk bû, ji bo dayîka min şerê bavê min pir dikir û li himber wî disekinî û bi mejî û zanebûna xwe bavê min razî dikir, ji ber bavê min bi dayîka min re timî şer dikir û bê sedem

nakokî derdixist holê, mirina wê bandoreke mezin li ser malbatê kir, heta yek ji malbata me hebe wê ji bîr nakin.

Ez çiqasî bêjim ez nikarim wê îfade bikim ji ber min jî demekê pê re jiyan kiriye, ez wê demê zarok bûm, lê min di kesayeta dayîk û xuşka xwe de hezkirinek ji dil û kezebê didît, bavê min jî pê êşiya, lê ne wekî dayîka min.

## Bavê Min

Bavê min mirovekî bi temenê xwe mezin bû, ji dayîka min bi temenekî mezintir bû, pir caran nakokiyên dayîk û bavê min çêdibûn, wekî çawa nakokiyên jin û zilamên yên di nava civakê de çêdibûn nakokiyên wan jî hebûn, ev jî ji nezanebûna wan bû, ji ber ferqeke mezin di navbera temenê wan de hebû, pirê caran tiştek di ortê de neba jî bavê min dikir hêlehêl, şer û pevçûn bi dayîka min re dikir. Bavê min zilmekî gundî yê civaka kevin bû, zilamekî fewdal li gorî zanebûna xwe nêzîk dibû, dibistan nexwendibû, di aliyê fikrî de ne ewqasî li pêş bû, bi islamê ve girêdayî bû, mirovekî oldar bû bi limêj û rojiya xwe ve gerêdayî bû, bavê min pir hestiyar bû, mirovekî gundî bi mal, zarok, kar û xebata xwe ve girêdayî bû.

Bavê min mirovekî welatparêz bû, mala wî ji her kesî re vekirî bû, çi kesê ji bo kurd û kurdistanê kar dikirin mala wî jê re vekirî bû.

Tê bîra min li gorî zanebûna xwe li ser kurdan daxivî û ji me re çîrokên kurdî jî digotin, tê bîra min jî miseceleke me hebû timî li şerît û stranên kurdî guhdar dikir, bi taybet li şerîtên dengbêjî û şirîtên şeran, ew şerên ku di navbera kurdan xwe bi xwe derdiket û şerên ku di navber kurd û tirkan de derdiket guhdar dikir û pirê caran li ber wan stranan digiriya û digot kurd bê aqil in, çima şerê dijminê xwe nakin çima şerê hev dikin?! kurd nafikirin ku dijmin wan berdidin hev û fêdê ji wan dibîne. Heger kurd xwe bikin yek û hev bigirin wê demê cîhan tev de bi wan nikare.

## Dayîka Min

Dayîka min di jiyana xwe de pir zahmetî dîtiye. Dema zewicî bi temenê xwe biçûk bû û bavê min pir jê mezintir bû. Jineke bi temen biçûk û zilamekî bi temen mezin helbetê wê nakokî di navbera wan de hebe û di dema wan de zewaceke bi vî rengî normal û pê kêf xweş dibûn.

Di nav civakê de jin çi ye û çawa jiyan bike, fikirandin li ser vê yekê kêm bû, ji ber qîmetê jinê di nav civakê kêm bû, dayîka min jî bû qurbana zihniyeta civakê. Dê û bavê min jî bi vî rengî jiyan dikirin.

Em zarok piranî li aliyê dayîka xwe bûn, em bi dayîka xwe re ne tenê wekî zarokên wê bûn em hevalên wê bûn jî, ew jî dayîka û hevala me bû, piranî me şerê bavê xwe dikir û pişta dayîka xwe digirt, ji ber tenduristiya wê ne baş bû, ev tenduristî hemû ji kul û derdan xwe dane pêş.

Ew zehmetiyên di jiyan xwe de û mirina her du xuşkên min bandoreke mezin lê kiribû, dîsa feqîrî û tunebûna di wê demê de hişt ku malbat pir zahmetiyan bibîne, ev jî bandor li ser dayîka min dikir û tim dayîka min ji bo tendirustiya xwe diçû cem bijîşkan.

Di dawiya xizaniya malbatê de dayîka min bû qurbana tunebûnê. Ew emeliya ku jê re çêkirin ji ber ku bijîşk û nexweşxan e bi belaş bûn, dayîka min bû qurban. Ji bo ku bijîşk xwe fêr bikin wekî qesaba û bê hesab ew kirin qurbana fêrbûna xwe. Negerk bû emeliyek bi vî rengî were çêkirin,ji ber tendiristiya wê sil bû û ji bê diqetbûna bijîşk tahlîlê wê bi ya jineke din guhertibûn, ev

jî ji bê cidiyeta bijîşkan e û nêzîkbûnek ne mirovahî ji nexweşan re xwe dide pêş û bijîşk tenê ji bo berjewendiyên xwe kar dikin. Bi vê emeliyê dengê dayîka min qut kirin, zengelolka wê jê kirin û têlên dengê wê qut kirin. Ji sala 1986`an de dengê dayîka min tune ye. Berî vê emeliyê jî nexweşiyên wê hebûn, wek eseb, bêhna wê diçikiya û demekê şeş heyvan dest û nigekî wê pûç bû û li erdê ma, pir nexwşiyên wê hebûn nayên bîra min.

Di dawiyê de hemû bi vê emeliya nerast pir êş kişandin û dayîka min heta niha jî wê êşê dikşîne, ev êş û zehmetiyên ku dayîka min jiyan kirine vedigere zewaca wê û bavê min a şaş ya ku ne li gorî hev bûn.

Hemû jin êşê dikişînin ji ber pergalên di cîhanê de desthilatdarên zihniyeta zilam e û nêzîkbûna civakê ji jinê re bi vê zihniyeta paşketî êşan ji jinê re çêdike û êşên jinan tev de di kesê dayîka min de kom bûne, dayîka min jî bû qurbana zihniyeta civakê û heta niha bi van êşan re rû bi rû ye.

Dayîka min di nava jinan û civakê de pir dihate hezkirin, jinek e di aliyê kesayeta xwe de xurt û bi heybet bû, ne weke wan jinên feqîr û belengaz bû, her kesî hesab jê dikirin, heta bavê min jî bi vî rengî nêzîk dibû. Dayîka min pir bi aqil tev digeriya, heta niha jî kesayeta wê bi vî rengî ye, lê niha bi temenê xwe mezin bûye û di têkiliyan de pir vekiriye, bi her kesî re li hev bû, bi mezina re mezin e bi biçûkan re biçûk e, ew ji nîqaşan re vekiriye, jinek e li hemû nûçêyên cîhanê guhdar dike, ne xwendevan e, lê di zimanê erebî de weke bilbil e, dayîkeke welatparêz e, jineke pir henûn û atifî ye, ji despêkê de tiştên biçûk û vala layiqî xwe nedidît û ji bo pirsgirêkan dikarîbû çareseriyê jê re bibîne û

bi bêhneke fireh nêzîk dibû û çareserî dida pêş, lê dîsa di aliyê zanistî de ne di zanebûna wê de bû, ji ber vê yekê nakokiyên dê û bavê min xwe didan pêş. dayîkeke tu carî cudatî nedixist navbera zarokên xwe de, nedigot ev keç e û ev xort e û me bi vê terbiyê mezin kirin.

Di malê de em xuşk û bira wek hevalên hev bûn, ev bingeha xwe ji terbiya dayîkê digire, berî em partiya PKK`ê nas bikin jiyana me di malê de bi vî rengî bû, gundî û merivên me jiyana me ji despêkê de baş nas dikirin. Piştî me PKK`ê nas kir bêtir guhertineke bingehîn di jiyana me de hate çêkirin, di wê demê de bavê min çû ser dilovaniya xwe, em heşt zarok bûn sê xuşk û pênc bira bûn, birayê min hecî ê ji dayîka min Fincê bû, ew ji me başqe bû, xuşka min a mezin navê wê Fincê bû navê wê li dayîka min Fincê kiribûn ew jî zewizî bû, lê em zarokên din me bi hev re jiyan dikir.

Em keçik neçûn dibistanê,sedema wê jî zihniyeta civakê a kevin vedigere, digotin wê keçik ji bo çi herin dibistanê, bi vê zihniyeta paşketî bavê min jî nehişt em herin dibistanê. Birayê min Dirêhî, mihdî û mihemed heta refa bekelorya dibistan xwendin û dev jê berdan û piştre tevlî partiyê bûn. Piştî tevlîbûna wan kes tune bû mal bi rê ve bibe ji ber vê birayê min Bahdîn heta refa neha xwend, bawername girt û dev ji dibistanê berda û birayê min Ristem heta refa hefta xwend û wî jî berda. Di nav mala me de me tevahî bi hev re kar dikirin, her kesî zanîbû karê wî /ê çi ye,bernameya karê me hebû, her kes li gorî vê tev digeriya.

Xuşka min zerga a herî zahmetî di malê de kişandiye, ew ji me

mezintir bû em sê jê biçûktir bûn tevlî partî bûn, her sê birayên minî din ji me biçûktir bûn li gorî dihate xwestin nikarîbûn malê bi rê ve bibin, hîn tam tê negiştibûn. Dayîka min dikarî malê bi rê ve bibe, lê nexweşiyên wê nedihiştin, berî hevalê Dirêhî tevlî partî bibe, di nava erdê me de bîr kola bûn meşrûh çêkiribûn, pere pir ji dewletê û ji derdorê anî bû. mala me di aliyê madî de pir deyindar bû, dema heval Dirêhî tevlî partî bû, mala me nema karî xwe ji bin deyna derxin, heta niha jî wê êşê dikişînin. Bargiraniya malê tev ma li ser milê xuşka min û birayên min jî ji aliyê tevgera wî meşrûhê de ne hakimbûn, ne di zanebûna wê berpirsiyartiyê de bûn. Di aliyekî din de xwedî derketina li dayîka min û xwedîkirina wê, me barê wê pir giran kiribû. Bi rastî jineke bi rihê berpirsiyartiyê tev digeriya.Mala me ji partî re vekirîbû, wekî qampekê ji partî re bû, ji sala 1985`an çûn û hatina hevala li mala me hebû, civînên partî û perwerdên hevalan bi sedên caran li cem me dihatin meşandin, xuşka min zerga xizmeta hevalan dikir, roja ku heval ne hatana cem me pir aciz dibûn, digot qeyî me tiştek winda kiriye.

Gereke em tucarî keda wê ji bîr nekin.

## Birayê Min Dirêhî Navê Tevgerî Deyax

Heval Dirêhî navê wî yê tevgerî Deyax .

Heval Dirêhî ji biçûkaniya xwe de dixwend û di ber xwendina xwe re kar dikir û alîkariya malê dikir, heta refa bekeloriya xwend paşê dev ji xwendinê berda û berpirsiyatiya malê bi rê ve dibir, di wê demê de partî nas kir, heval Dirêhî di nava civakê de dihate hezkirin û di nav malbatê de ciyekî wî taybet hebû. Di nava eşîrê de pir dihate qebûlkirin û her kesî pirsgirêkên xwe pê re par ve dikir, bi aqil tev digeriya û ciyê xwe di nav her kesî de dadigirt. Ji biçûkaniya xwe de di dibistanê de pir zîrek bû, di gund de pir zarok dihatin dersên xwe li cem wî çêdikirin, di dibistanê de çi pirs jê dihat kirin bersiva xwe dida çi di xwendin, hesab,ol, nivîsandinê û hwd de zîrek bû, di refa pêncan de bû, xeta wî pir xweşk bû. Mamostê wî feleqe lê da û gotê ev ne xeta te ye, hate malê û ji me re got mamostê min dibêje ev ne xeta te ye û li min da, bavê min çû cem mamostê wî û jê re got wî deneme bike ka çawa ye, di dawî de mamostê wî hate mala me û got wî min bibexişînin. Bi zaroktiya xwe şa nebû, kesayeta wî newekî ê zarokan bû, hîn biçûk bû weke mezinan li xwe dinerî û tev digeriya. Dema giha refa heftan çû bajêr xwend û di ber xwendina xwe re kar dikir, dema diçû dibistanê rewşa malê nezêde baş bû, di aliyê madî de malbat pir xizan bû û di aliyê mesrûfa wan de zehmetî dikşandin, ji der vê yekê ji refa heftan heta gihaşt refa bekeloriya xwendina xwe dewam dikirû di ber re kar dikir û mesrûfa xwe û heqê kiriya xaniyê girtibûn ji bo xwendinê derdixist. Xortekî bixwîne û kar bike ji bo xwe bi rê ve bibe helbetê wê zehmetiyan bibîne, dîsa alîkariya birayê xwe

ê dixwendin dikir û alîkariya malê jî dikir û tim serkeftî derbas dikir û yek salê di refa xwe de nema.

Ji despêkê de hêviya malbatê di heval Dirêhî de hebû, ji ber hîn biçûk bû mal bi rê ve dibir, çi pirsgirêkê di nav eşîrê de heba çareserî jê re didanî û ji merivê xwe re baş bû, gava merivên wî ev nêzîkbûn didîtin pir bi hurmet nêzîk dibûn, hemû beşên di nav civakê de ên ku ew nas dikirin jê razî bûn, kesayeteke bi biçûkan re biçûk bû û bi mezinan re mezin bû, kesekî pir paqij û li himber dê û bavê xwe û her kesî bi hirmet bû.  taybetmendiyên wî li yên xuşka min Terfa hatibûn.

Heta gihaşt refa bekeloriya partî nas kir, dev ji dibistanê berda, lê pir pirtûk dixwendin, di aliyê fikrî de pir zana bû, ji biçûkaniya xwe de di nav nakokiyan de mezin bû û dixwest di xwendinê de bi serkeve, lê rewşa malbatê û xizantiyê ew mecbûrî kar kir. Hevalê Dirêhî serê xwe bi pirsgirêkên malbatê pir dêşand. Bavê min pirê caran şer li himberî me dikir. Heval Dirêhî pir bi rêz nêzîk dibû, di malê de pir alîkariya xuşkên xwe dikir, digot divê têkiliyên me di aliyê civakî de vekirî bin ji ber têkiliyên teng mirovan dûrî mirovetiyê dixîne.

Heval dihatin gund derbasî malan dibûn, heval Dirêhî bi wan re li gund digeriya û diçûn hinek gundên din jî.

Birayê min Dirêhî xebata gund û hinek gundê din jî bi rê ve dibir û hêdî hêdî fermî bû.

Heval Dirêhî di sala 1990`î de tevlî partiyê bû û xebat di navçê de dimeşand, di wê demê de hinek pirsgirêk di nav xebatê de hebûn. Pirsgirêkê hinek kesan di ortê de çêbûn, bandora xwe li ser xebatê dikir. Tevlêbûna heval Dirêhî bandoreke mezin li

ser malbatê kir,ji ber kesek tune bû malê bi rê ve bibe. Heval Dirêhî, Mêhdî û ez em yên mezin bûn. Her sê birayên min yên din ji me biçûktir bûn, hîn negihaştibûn ku malê bi rê ve bibin.

Heval Dirêhî di nav xebatê de bû, ez jî tevlî partiyê bûm, ez di sala 1991`ê de tevlî partiyê bûm, min di navçeyê de xebat dimeşand, di wê demê de şert û zurûfê malê hinekî zehmet bû.

Heval Dirêhî xebata xwe dikir û mal jî bi rê ve dibir, di despêka ku rêxistina partiyê di Rojavayê Kurdistanê de ciyekî xwe yî taybet girt, Kesên ku tiştên nerast belav dikirin ji bo partiyê tehşîr bike, partî wan tehdîd dikirin û li wan dixistin. Di herêmê de berpirsiyarê wê demê pilanek çêkirin ku li yekî bixin, ew kesê ku lêdanê buxe ji Qamişlo bû. Pilan di navbera hevalên Amûdê û Qamişlo de bû, ji ber herêma Cizîrê di aliyê rêxstinî de bi Eyaleta Qamişlo ve girêdayî bû, ew pilan ku bi sîlah fîşekan bavêjin nigê wî û wî birîndar bikin ji bo bitirs e. Wî kesî gotinên ne baş li ser serokatî û partiyê gotibûn, wî birîndar kirin lê ew nekuştin.Belbelak mezin çêbû, ew kesên ku ev kar pêk anîn reviyan û li şûna xwe mitorê ku pê çûbûn hiştibûn, dewletê mitor bir û nas kir li ser navê kê ye. Malbata zilamê birîndar dewlet xistin tevgerê, her kesî xwe dan aliyekî û xeber belav kirin û gotin Dirêhî ev kar kiriye. Dewlet ket istinfarê, wêneyê heval Dirêhî di rojnameyan de belav kirin û gotin ê vî kesî ji me re bîne em ê sê meliyonê sûrî bidin wî.

Ev ne tenê dewletê di got, malbata wî jî li pê vê tev li hêviyê bûn.

Heval Dirêhî wê demê xwe da alîkî û demekê ma, paşê çû Ekademiya Masûm Qorqmaz perwerdeya serokatî dît. Dewlet

ket istinfarê, ji Qamişlo girtin ser mala me, tiştek li ser hev nehiştin, mal serobinî hev kirin, tiştek di malê de nedîtin û kesî ji malê nizanîbû ji bo çi ye yan çima ev belbele çêbû, li Dirêhî pirsîn, malbatê gotin çûye Hesekê, ew bi rastî çûbû Hesekê ji bo kemyonekê bîne û genimê xwe rake mîra, genim jî nû çinîbûn ji bo bibin mîra, ew genim heciz kirin. Dewlet ji Qamişlo, Hesekê û ji Amûdê jî yek diçû yek dihat digotin ka Dirêhî û her du birayên min yên ji min biçûktir girtin û birin, paşê deh kesên din ji merivên me girtin û xistin zindanê, demekê li cem wan man paşê ew berdan, lê her du birayên min bernedan man di zindanê de û heyvê sê - çar carî di hatin mala me, em tehdîd dikirin, digotin hûnê bêjin ka Dirêhî li kû ye yan em ê we jî bigirn, ji dayîka min re digotin tê bêje Dirêhî li kû ye yan em her du kurên te bernadin, di heyvina bi şev û roj dora gund dorpêç dikirin, mala me li pêşiya gund bû nêzîkî gir bû timî bi şev tirmbêlên xwe nêzîkî mala me disekinandin. Havîn bû em ji der ve radizan, di xwestin me bitirsînin, mal mûraqebe dikirin bê ka bi şev kes tê cem me yan na, dayîka min ji wan pir aciz bû û ji wan re got:” Em nizanin Dirêhî li kû ye, ew jî dixazin hûn wî bînin, kes tune vê malê bimeşîne, hûn dixazin min û her du keçikên min jî bibin, keremkin em ê jî werin di zindanê de rûnên, hûn her car me tahdîd dikin, em ji zindanê natirsin”.

Sê heyvan her du birayên min di zindanê de pir eşkenc kirin, wan pir êşandin.

Piştî sê heyvan tiştek ji me bi dest nexistin, hêdî hêdî çûn û hatina xwe kêm kirin. Paşê her du birayên min jî ji zindanê

berdan, piştire tu encam negirtin hêdî hêdî xwe ji mala me qut kirin.

Di wê demê de ew kesên ev kar pilan kiribûn, berpirsiyarê herêmê bû, pilaneke ne di demeke guncav û ne di cihê guncav de pêk anîn, şaştiyeke pir mezin kirin û tu hesab ji wan nehat xwestin, di encam de ew kesên berpirsiyar û ên ku ev kar pêk anîn pênc kes bûn, niha her pênc ji nav me reviyane, her pênc bênamûs derketin xiyanet bi serokatî, şehîd û gel re kirin, çi kesên ku ji nav partiyê direvin xayin in, bênamûs in ji xeta serokatî derketin eslen evana na layqî şoreş û wê rûmetê ne.

Di wê demê de heval Dirêhî li ekademiya Mahsûm Qorqmaz bû û perwerde li cem serokatî dît. Demekê li ekademiyê ma û paşê derbasî çiyayê kurdistanê bû. Heval Dirêhî di sala 1992`an de derbasî çiyê bû.  Gurûpa wan dema derbas bûn qoriya di wexta xwe de nehatin bi wan ve û QDP`ê ew girtin. Yekî gundî wan dîtibûn û xeber dabû QDP`ê. Paşê QDP`ê  wan nêzî ava mezin berdan. Bi vî rengî derbasî milê rojavayê kurdistanê bûn, demekê li cem serokatî man piştre dîsa derbasî çiyayên kurdistanê bûn. Wekî şoreşgerekî xwesteka wî çiyayê kurdistanê bû û ev xwestek di jiyana wî de pêk hat. Dema heval Dirêhî derbasî çiyê bû min ew li ser rê dît. Ez di nav xebatê de bûm, min li Amûdê kar dikir. Em çend seatan li cem hev man paşê xatir ji min xwest û çû. Heval Dirêhî di sala1992`an de derbasî çiyê bû, çû eyaleta Botanê, ji Botanê derbasî Bêtişe Babê bû. Heval Dirêhî navê wî herekî Deyax e. Heval Dirêhî demeke dirêj li welat nema. Operasiyonên dijmin dest pê kiribûn. Li Bêtuşebabê temşîtatê dijmin derketin. Hevalan xwe paş ve kişandin. Ji bo

xwe saxlem bikin, hevalan xwe gihandin şikeftekê. Bêlûka heval Dirêhî lêbû li Bêtişebabê bû. Bêlûka wan xwe gihandin şikeftê û derbasî hundirê şikeftê bûn. Nizanîbûn ku dijmin bombe di hundirê şikeftê de danîbûn. Çawa heval derbasî şikeftê dibin, heval Dirêhî pê li bombê kir û teqiya. Nigê heval Dirêhî di bin congê re jêbû. Hevalan nigê wî girêdan ji bo xwîn pir jê neçe û wî birin ji bo ku derman bikin, lê xwîn ji birîna wî pir çûbû ji ber wê di rê de şehîd dikeve. Heval pir li ber dikevin.

Hevalên ku bi Dirêhî re mabûn ji min re li ser vê bûyerê gotin, heval Dirêhî pê li bombê kir û birîndar bû. Bi wê birînê şehîd ket. Ji vê zêdetir ez nizanim. Min heval Dirêhî li çiyê nedît, heval Dirêhî û heval Mêhdî jî hev du li çiyê nedîtin. Heval Dirêhî li Botanê, Bêtuşebabê bû. Heval Mêhdî li Zaxrosê bû. Me her siyan hev du li çiyê nedît.

Dema ez çûm çiyê her du jî şehîd ketibûn. Min her du jî li çiyê nedîtin. Heval Dirêhî di sala 1993`an de li Bêtişebabê Şehîd ket.

## Birayê Min Mêhdî—Dilovan

Heval Mêhdî di zaroktiya xwe di dibistanê de zîrek bû, xortekî çav vekirîbû, ji tu kesî neditirsî û hesab nedikir, di nav zarokan de her kes hevalê wî bû. Bi hev re dilîstin, hevalên wî yên di dibistanê de jê diqeherîn û aciz dibûn, ji ber heval Mêhdî di dibistanê de ji wan zîrektir bû. Heta refa şeşan li gund xwend û serkeftî derbas kir, ji refa heftan û şûn de çû bajêr, ji refa heftan heta refa bekeloriya li bajêr xwend. Her sal serkeftî dibistan diqedand, yek salê di refa xwe de nema, di refa bekeloriya de bi hevalan re digerya têkiliyên wî bi partî re hebûn, nediçû dibistanê û ji bo dibistanê xwe amade nekir, bû wexta ezmûnan çû û bê hazirî qedimand, di refa bekeloriya de bi ser neket, ji ber timî bi hevalan re digeriya xwe amade nekiribû helbetê bi ser nakeve. Heval Mêhdî carna bi heval Dirêhî re kar dikir, ji bo karibin xerckirina xwe derxin.

Heval Mêhdî wekî heval Dirêhî kar nedikir, ji bo malê û ji bo xwendina xwe jî nekiriye, ji min mezintir bû, em bi hev re digeriyan, me bi hev re bi gogê, xar û kaba dilîst.

Temenê wî derdora şazdeh salî bû, pir digeriya û bi xortaniya xwe şad bû. Timî ji dayîka min re di got divê hûn ji min re yekê bînin her Dirêhî na zewic e, ez ê bizewic im, pir kêfçî, henûn û dihate hezkirin, pir rêz ji dayîka min re digirt, bi dayîka me şadibû û wê radihişt û li ser kolînga xwe dikir û wê di gerand, ew bi dayîka min re çawa bû bi me re jî wiha nêzîk dibû.

Pir tişt bi me re hevpar dikir, nîqaşên siyasî û civakî bi me re

dikir, me pir jê fam nedikir, kesekî pir bi axaftin bû, bi vî rengî em bi hev şa dibûn.

Heval Mêhdî di aliyê kesayetî de pir xurt bû, tu kesî nikarîbû wî bixapanda, çiqas kes bi pilan li dora wî dizîvirîn nikarîbûn wî ji rê bibirana. Heval Mêhdî di ramanên xwe de pir kurwir bû, timî pirtûkên li ser cîhanê dixwendin û yê Markis Lênîn û pirtûkên dîrokî dixwendin, ciyekî wî taybet di nav civakê de hebû, di gundê me de pir dihate hezkirin, her kes dixwest bi heval Mêhdî re bibe heval.

Di têkiliyên xwe de pir fireh bû, nîqaşên wî bi xort, kal, pîr, keç û zarokan re çêdibû.

kesekî pir kêfçî bû, gera wî li her derê hebû, di jiyana xwe de dixwest fêrî sazê bibe, hîn zarok bû dixwest sazeke wî hebe û xwesteka wî bû ku bavê min jê re sazekê bîne, lê bavê min timî zrûfê malê yên madî dikir hicet û xwesteka wî pêk nehat. Kesekî intîqamcî bû. Heyfa xwe ji kesî re nedihişt timî heyifa xwe hiltanî . me ji hev pir hez dikir, ji ber bavê min temenê min ji yê wan mestir danî , heval Mêhdî pir li ber min diket û dêşiya. ji zaroktî de aliyêkariya min pir dikir bitaybet di xwendin û di tîpên erebî de ji ber pir zehmet bûn. Heval Mêhdî û heval Dirêhî min fêrî xwendina erebî kirine ji ber ez neçûme dibistanê û her du ji min mezintir bûn.

Heval Mêhdî lêgerînên wî di jiyaneke cuda de hebû, rewşa jiyana di nav civakê de qebûl nedikir û jê nerazî bû, timî di axafitinên xwe de digot ev jiyaneke ketî û koletî ye, gerek ev jiyan were guhertin, pergala di nav cîhanê de civak fetisandiye, li himber pergala heyî pir nakokî jiyan dikir. Timî bi van nakokiyan

bi xwe re di şerekî de jiyan  dikir û pirtûkên li ser dîroka kurd û kurdistanê dixwendin  û nîqaşên wî timî li ser kurdan bû, digot çima kurd bindoxin. Heval Mêhdî jiyana xwe bi vî rengî dewam kir heta PKK` ê nas kir. Piştî demekê ji xebat û tevgerê re xebata partiyê di herêmê de pir li pêş ket heval pir bûn, ji herêmê pir kes tevlî partiyê bûn. Di despêkê de heval Mêhdî demekê kar di herêmê de meşand û di sala 1987`an de tevlî partiyê bû û xebatên di nav gel de meşand.Di sala 1988`an de çû ekademiya Mahsûm Qorqemaz, dewrak perwerdê li cem Serokatî dît, paşê Serokatî wî şande xebatê li bajarê Amûdê, wekî berpirsiyarekî xebat dimeşand, bandora heval Mêhdî di aliyê kesayetî û rêxistinî de pir xurt bû.

Kesekî pir bi heybet bû, apoçiyê despêkê bû, kesekî pir bi qural bû, di aliyê perwerdekirina gel de bi rijd bû, di aliyê rêxstinî de gel bi bawerî razî dikir û bi rêxistin dikir, pir zîz û şiyar bû, tiştên şaş di heman demê de tewrê xwe li himber didanî û nedipejirand, kesayetan zû nas û keşif dikir. Pir radîkal bû, serê xwe ji kesî re neditewand, nizanîbû rûnişta timî di tevgerê de bû, li gund û bajêr teva digeriya û westandin li cem wî tune bû.

Her car  digot gerek mirovê şoreşger timî di tevgerê de be û divê fedekar, canfîda û xwedî biryar be, divê bêhin fireh û însiyatifî be, bi ruhê êrîşê bi ser kar de biçe, divê netirse û parastina xwe û gel bike, divê di aliyê civakî de têkiliyê wî fireh be, divê ne mirovekî girtî be, divê xwe perwerde bike û xwe li pêş bixe, ev nîqaş tim bi me re dikir. Piştî demekê dîsa çû akademiya Masûm Qorqemaz, paşê derbasî çiyê bû. Di sala 1990`î de derbasî çiyayê kurdistanê bû, ji çiya sê nameyên wî

ji malbatê re hatin, di wan nameyan de pir gotinên bi rûmet hebûn û gotinên xweş li ser serokatî, PKK`ê û şoreşa kurdistanê nivîsandibû. Piştire ji çiyê derbasî Eyaleta Zaxrosê, milê Şehîda û Xakurkê bû, li van Eyaletan karê piratîkê meşandiye, başqe ez nizanim li ku jî maye.

Li Zaxrosê di operesyona Robarokê de heval Mêhdî şehîd ket, di wê operesyonê de ne tenê heval Mêhdî gurûpek mezin ji hevalan şehîd ketin.

Ew operesyona wan mezin bû qereqola dijmin ji binî de tune kirin û bikêfxweşiyeke mezin vegeriyan, lê hesabê qoruçiyên Eşîra Gerdiyan nekiribûn, qoruçiya li pêşiya wan kemîn danîbûn, li hevalan reşandin û pir heval şehîd ketin.

Heval Mêhdî û gurûpeke mezin li ser destê Eşîra Gerdiyan şehîd ketin,li Zaxrosê nêzîkî tepê Govendê ew eşîr li wir in, di dîroka PKK`ê de operesyona Robarokê bi nav û deng e

## Dewamkirina Jiyana Malbatê

Malbata min welatparêz in, ji welatê xwe û kurdan hez dikin, çiqas serhildanên di hundirê kurdistanê de derketin pê ve girêdayîn bûn. Di despêkê de ne malbateke ewqasî pêşketî bûn, zanebûna wan li gorî famkirina wê demê bû, ji ber civaka kurd nehatiye perwerdekirin. Malbata min jî weke hemû malbatên kurd nehatine perwerdekirin, ji ber tevgerên kurd yên ku hebûn jî gelê kurd perwerde nedikirin ji ber armanca wan tevgeran kursî bûn ne perwerdekirina gel bû, nedixwestin gel pêş bikeve, dixwestin nezan bin ji bo rastiya wan nas nekin.

Malbata min jî neferek ji civaka kurd a nezan bû, ku bûne qurbana wan kesên xwe rêveberên kurdan didan nîşan. Malbateke di aliyê civakî de vekirî bûn û pir bi hev girêdayî bûn. Bi vî rengî dewam kirin heta PKK`ê nas kirin.

## Naskirina Malbatê ji PKK`ê re

Di sala 1985`an de malbata min PKK`ê nas kirin, çawa cara yekê hevalên despêkê hatin mala me, bi yek carê malbat bi wan re bûn yek, mala xwe ji PKK`ê re vekirin. Di despêkê de dayîk û bavê min û em jî bi wan re bûn yek, ez dikarim bêjim malbateke li hêviya PKK`ê bû, bi hemû ruh û ramanên xwe bi PKK`ê re bûn yek, naskirina wan ji partî re bi rengekî atifî bû, ne naskirineke zanestî bû. Di wê demê de heval pir dereng dihatin gundê me, salê carekê yan du caran dihatin gund, ji bo alîkariya mûsim li nav gund digeriyan, heval Mêhdî bi wan re derbasî malan dibû. Dem bi dem çûn û hatina hevalan li gund zêde bû û derbasî hemû malan dibûn, civîn ji gundiyan re çêdikirin, di civînan de partî bi wan didan naskirin. Heval Mêhdî bi hevalên xort re derbasî malan dibû, ez û keça xaltîka min heval Gulîstan bi hevalên keç re derbasî malan dibûn.

Di despêkê de pir kesên ji gund malên xwe ji partiyê re vekirin, piştî armanca partiyê nas kirin çi ye û ji bo alîkariyê nedin û nerin civînan û ji bo zarokên wan tevlî partiyê nebin sê parê gund malên xwe girtin. Di aliyê rêxistinî de xebatên partiyê di navçeyê de zêdetir bû. Hatina hevalan li gund pir çêbû, gurûpên keç û xortan çêbûn, tê bîra min cara yekê amadekirin Newrozê me li gund kir, em gurûpek keç û xort bûn û ji mala me tenê dayîka min ne di nav me de bû.

Em çar kes di dîlan û stranan de bûn, sê jî helbest dixwendin û ên din jî keç û xortên gund bûn. Koma me ji gund temam

bû, me sê heyvan amadekariya xwe dikir, di wan sê heyvan de sê parê amadekariya me li mala me dihat meşandin. Gundiyan qebûl nedikirin em li malên wan kom bibin. Heval Mêhdî gurûpa komê birêxistin dikir, ew berpirsiyarê me bû, ji ber em timî li mala me bûn û me perwerdê xwe li wir dimeşand, dayîka min di nav me de bû pir bi me şa dibû.

Me gelek zehmetî kişand ji ber pir giran bû, ew cara yekê bû me li gund Newroz pîroz kir, miletê gundê me û yên çend gundên din jî kom bûbûn, Em di heyecaneke mezin de bûn, cara yekê bû me derketin pêşiya milet. Li gorî serpêhatiyên me yên kêm û amadekirinên me kiribûn me hemû pêşkêş kirin, tevî ku şaştiyên pir hebûn wek şaştiyên di govendê de û şaştiyên stran û şano jî, lê milet bi wan amadekirinên me kêfxweş bû û em jî. Zanebûna me heta wê astê hebû, me ew Newroza li gund çêkir û bandoreke mezin li navçeyê tevî kir. Bi demekê, Piştî tevlêbûna heval Mêhdî ji partiyê re malbatê bêhtir partî nas kir û heval di nav kar de pir bûn, hatina wan li mala me pir çêdibû.

Di wê demê de rêxistin di herêmê de hinekî siviktir bû ,mudaxele ji aliyê partiyê ve hate çêkirin, hêdî hêdî tevlîbûn di nav partiyê de çêdibû, di mala me de em şeş kes bûn, me her şeşan kesan dixwest tevlî partiyê bibin, lê hevalan erê nekirin û gotin partî ewqas kes ji malekê tevlî nake, hûn dixwazin partî hesab ji me bixwaze.

# Jiyana Min

Ez keçeke kurd im, navê min Şêxa Mihemed e, navê minî tevgerî Dîrok Dilovan e, ez ji gundê Tilxenzîr im, gundê me girêdayî bajarê Amûdê ye. Navê bavê min Ebdilqadir e, navê dayîka min Merdiya Hisên e. Birakî min ji dayîka min Fincê heye. Em sê xuşk û pênc bira ji dayîka min Merdiya hebûn. Em sê kes tevlî partiyê bûn. Du birayên min di nav PKK`ê de şehîd ketine û ez niha di nav partiyê de me.

Malbata min ji refa ortê ye. Di bin bandora islamê de jiyan dikin. Malbatek gundî û karkerin bi keda xwe jiyan dikin. Ji despêkê de têkiliyên wan yên civakî pir bûn. Pirsgirêkê wan bi civakê re nîn bûn. Malbateke di nava civakê de tên hez kirin. Malbateke pir atifîne û bi hev e girêdayîne. Malbatek ji despêkê de welatparêz in. Ji netewa xwe hez dikin. Bi serhildanên di kurdistanê de derketine bander bûne. Malbatek feqîrtî û xizanî di jiyana xwe de pir dîtiye. Di nava zor û zehmetiyan re derbas bûn. tiştek di dilên wan de nîn bû. Li beranber meriv, cîran û civakê tu hiqid û kîn di dilên wan de nîn bû. Tu carî şer û pevçûn di navbera wan de çênebûye. Dîsa tu carî şer û pevçûn di navbera wan û cîran û gundiyan de çênebûye. Despêkê dema bavê min sax bû şerê wî û dayîka min hebû, lê piştî mirina bavê min şer nebû. Cîran û gundî li me matmayî diman, digotin hûn tu carî şer bi hev re nakin. Pir hevalên meyî keç di gund de hebûn digotin em û birayên xwe li hev nakin, em şerê hev dikin. Çima hûn û birayên xwe ji hev re baş in.

Mala me ji her kesî re vekirîbû. Cîran, gundî û ji gundên derdora me jî mala me qasid dikirin. Malbateke gundî û feqîr têkiliyên xwe bi her kesî re hebû. Tevî vê yekê jî şaştiyên wan

jî hebûn, li gorî dihate xwestin beranber civakê kêmasiyên wan hebû.

Malbateke çawa partiya PKK`ê nas kir hema wê hemêz kir. Di gundê me de her kesî tevî merivên bavê min digotin ev mal dîn in. Merivên dayîka min Yemînîn in xwe ji dayîka min xeyidandin û digotin Merdiya dîn e bêaqil e.Timî ji dayîka min re digotin bera heval neyên cem we, bi aqilê we dikenin. Digotin hûn kawik in, heval we ji rê dibin, henekê xwe bi we dikin.

Dayîka min li himberî xwediyê xwe, bira û zarên apê xwe tevan sekinî û got ez PKK`ê  ji mala xwe qut nakim, heya ez hebim wê mala min ji PKK`ê  re vekirî be. Hûn qebûl bikin ez ev im û hûn qebûl nekin jî ez ev im. Bi salan dayîka min xwe ji merivên xwe dûr xist, têkiliyên xwe ji wan qut kir. Dayîka min pir ekis bû, heger aciz biba kesek li pêşiya xwe nas nedikir. Piştî şehadeta heval Mêhdî û heval Dirêhî hatin û çûyina dayîka min û malbata wê li cem hev çêbû. Li hev hatin hîna carnan ji dayîka min re dibêjin tu dîn e, lê dayîka min weke berê xwe aciz nake, ji ber zane heneka pê re dikin û pê şa dibin.

Ez wekî keçeke kurd di nav malbateke kurd e mezin bûme. Rewşa wan nedûrî malbatên kurd û civaka kurdistanê ye. Civaka kurdistanê çawa di jiyana xwe de zor, zehmetî û feqîrtî pir dîtine. Wan jî zor, zehmetî û feqîrtî di jiyana xwe de dîtine.

Ez ê ji zaroktiya xwe de dest pê bikim.

Ez di gund de mezin bûme. Du xuşk û birayên min ji min mezintir bûn. Sê birayên minî din jî ji min biçûktir bûn. Min û birayên xwe û zarokan di gund de bi hev re dilîstin. Piranî zarokên meriv û cîranên me bûn.

Lîstokên me xar, kab, gog, qafika, lîska negekîkî, xêzika gurover, goga niga, çav girtînkê, darikê şevê û hwd bûn.

Piranî em zarokên keçik bi van lîstokan dilîstin. Bi sedê caran di dawiya lîskê de şer û pevçûn di navbera me de derdiket holê. Ji despêkê de porê min dirêj û pir bû. Di şerê me de porê min digirtin û dikşandin, ji ber porê min zora min dibirin, lê min xwe ji wan xelas dikir û min dawa xwe tije kevir dikir û peyî wan diketim heta min ew tev de dixistin malên wan de. Yek yek nedihatin min ji ber bi min nikarîbûn, xwe dikirin kom kom û dihatin min, xala minî zeyîf nas kiribûn, porê min dikişandin, min tu carî heyfa xwe ji wan re nedihişt. Di avêtina keviran de ez pir zîrek bûm. Min kevir davêtin wan nîşana min pir xurt bû. Min kevir li ser û çavên wan didan, kevirekî min vala nediçû tev li wan diketin. Di zaroktiya min de çeka min ya esasî kevir bûn, min serê pir zarokan şikandiye. Ne bi vî rengî ba min bi wan nikarî bû, ji ber ez yek bûm ew pir bûn hemû jî merivên dayîk û bavê min bûn.

## Min Serê Xwe Şkenand

Carekê ez û gurûpek keç li hewşa me bûn, me bi hoqê dilîst. Min qehfik şil kir û bilind kir bê ka dora kê ye, min qehfik bilind kir û min ji zarokan re got xwe bidin paş. Qehfikê me bilind bû û hat xwarê li ser aniya min sekinî. Ser min şkest, xwîn jê hat, ez giriyam û beziyam cem dayîka xwe. Dayîka min serê min paqij û derman kir û ji min re got te serê pir zarokan şkenandiye dawî te serê xwe jî şkenand.

## Em Çûn Ber Berxan

Ez û birayê xwe di nav zadê xwe de li ber berxikan bûn. Me ji xwe re bûk û tirimbêl bi heriyê çêdikirin û me bi wan dilîst.

## Karika Minî Delalî

Tê bîra min, ez û birayê xwe me pez, berxik, karik û bizin birin nav zadê xwe. Bizinek me hebû pir şeytan bû,timî ji nav zadê me derdiket diçû nav zadê xelkê yên cîranê me. Ez pir jê aciz bûm, min rahişt kevirekî û avêtê. Li bizinê neket çû li karika wê ket. Kevirê min li serê karikê ket, karik gêj bû li erdê ket. Min pir ji karika xwe hez dikir. Ez û birayê xwe giriyan , min rahiştê û em çûn malê. Min ji dayîka xwe re got min karik kûşt, dayîka min got bera bi qurbana we be. Ez û birayê xwe em ditirsiyan ku dayîka me li me bixe, lê dayîka min kêr anî û karika minî delalî ser jê kir.

## Dara Tûwa

Ez û hevaleke xwe çûn bin dara tûwa ku em wê biweşînin. Me ji xwe re tû weşandin û xwarin û em ê biçûna cem hevaleke xwe. Di destê min de kaniyek hebû, min kevirek xistibû orta kaniya xwe de û em dimeşiyan, paşê em rastî dîk û mirîşkan hatin. Min ji hevala xwe re got ez ê kaniya xwe bavêm wî dîkî. Min kaniya xwe li ba kir û min avêt dîk. Kevirê min li nigê dîk ket, bû qajeqaja wan, ez û hevala xwe reviyan û çûn mala hevala xwe. Piştî demekê em dîsa çûn bin dara tûwa û me tû xwarin. Min ji hevala xwe re got ka em herin wî dîkî dibînin. Em çûn di ber malê re derbas bûn. Me dîk dît ku nigê wî şkestibû û bi daran cebirandibûn. Me ji xwe re bûkên dagirtî bi paçikan çêdikir, me paçik kom dikirin û didirûtin û me hundirê wê tije dikir û me bi heftokan jî dilîst.

Ez zarokek gerok bûm. Min bixwesta ez herim kû diçûm. Ez sorik bûm. Malbatê ji min pir hez dikirin. Ez ji zarokan pir şûm bûm. Di jiyana minî zaroktî de pir tişt hene, lê nayên bîra min.

Cîhana zarokan cîhaneke pir fireh e. Xeyalên zarokatî tiştên ecêb tê de hene. Xwezî mirov tim zarok bimaya. Zarok ew ên ku tama jiyanê ne. Ger zarok tune bin jiyan ditevize, ciyê ku zarok lê tune bin ew cî xerabe ye. Xwedî derketina li zarokan rûmeta herî mezin e.

Rengê zaroktiya min wekî hemû zarokên ku di nav malbat û civaka xwe de mezin dibin, ez jî zarokek kurd im di nav malbatek kurd de bi xuşk û birayên xwe re mezin bûme. zarokên

wê malbatê me tev bi hev re jiyan dikir. Di malê de têkiliyên min pir xurt bûn.

Ji zaroktiyê de min pir ji xwendinê hez dikir. Ez nêzî heyvekê çûm dibistanê. Mamoste pirtûk nedidan min, ji min re gotin temenê te mezin e, tu nayê qebûlkirin. Li gorî temenê min ê wê demê ez dihatim qebûl kirin, lê ji ber bavê min temenê min ji ê heval Dirêhî û Mêhdî mezintir di nifûsê de danîbû ez nedihatim qebûlkirin. Ez timî digiriyam û min digot çima pirtûkên hemû zarok û hevalên min hene, çima yên min tune ne. Ji bo ku birayên min zû neçin eskeriyê, ez û xwendina xwe bûn qurban mejiyê kevin yê malbat û civaka kurd. Ez ne di wê ferqiyê de bûm û min nizanîbû xwendin çi ye û ji bo çi ye. Timî min digot çima zarok û hevalên min diçin dibistanê çima ez naçim. Ji despêkê de du xwestekên min hebûn. Yek xwendin û ya din ez fêrî tenbûrê bibim. Di jiyana xwe de ez ji her duyan mehrûm mam.

Ev di jiyana min de bû nakokiyeke mezin, ez fêrî tenbûrê nebûm. Di aliyê xwendinê de ji zaroktiya xwe de min li malê bi birayê xwe re dixwend û dinivîsand, birayê min ji min biçûktir bûn di refa yekê de bû. Ez de demekê kin de fêrî tîpên erebî bûm. Tîpên erebî kit bi kit min bi hev ve girêdidan. Ji refa yekê de min bi birayê xwe re xwend, dema ew diçûn dibistanê û dihatin malê dersên wan çi bana min jî bi wan re dixwend û dinivîsand. Min zehmetî pir kişand heta ez fêrî xwendina erebî bûm. Min dersên wan zû ezber dikir û paşê min ezmûn dida wan. Heta ez mezin jî bûn min di malê de ji xwe re çi pirtûk heba min dixwend. Demekê di gund de mehwe ûmiyê vekirin. Keç ji gundê me çûn mehwe ûmiyê, di gund de mamostayeke jin ders dida refa yekê

û refa şeşan. Ji ber keçên  ku diçûn mehwe ûmiyê mezin bûn, mamosta jin ders dida wan. Ji ber dersên wan fermî bûn, min pir dixwest ez jî bi wan re biçim fêr bibim, lê bavê min nehişt ez herim. Dayîka min, xuşk û birayên min dixwestin ez herim ji ber ku bingehek xwendinê li cem min çêbibû. Em tev bûn yek  li ser bavê min, di encam de ez dîsa ne çûm. Em derbasî salakedin bûn. Dîsa ew mamosta jin li gundê me erkdar bû û gurûbeke keç ji gundê me çûn. Min dîsa xwest ez biçim û vê carê jî dayîka min, xuşk û birayên min pir alîkariya min kirin û bavê min razî kirin. Ez bi wan hevalên xwe re çûm dibistanê.

Em gurûpek hindik tevlî mehwe ûmiyê bûn. Başqe refa yekê û yê şeşan jî hebûn. Heta gurûpa me temam bû, nêzî şeş heyvan ez çûm dibistanê. Gurûba me heft kes bûn, me refa şeşan xwend bes em ê mehwe ûmiyê bûn, xwendina min pir li pêş bû. Ez di xwendin, nivîsandin, ol, bîrkarî û ezmûnan de li pêşiya hevalên xwe tevan bûm. Ez di xetê û resim de lawaz bûm. Heta dawiya dibistanê ez tenê ji wê gurûpê mam. Ez çûm heta dibistan bi dawî bû. Mamosteya me pir ked di ber me de da. Timî ji min re digot hevalên te tevan dibistan berdan tu berned e, tu pir zîrek e. Min dibstan bi dawî kir bawernameya xwe ya şeşan girt. Ez pir kêfxweş bûm. Xwendina min bi erebî li pêş ket min karîbû her tişt bixwenda. Bû saleke din mamosteya jin dîsa li gundê me mehwe mûmiyê vekir, lê hinek şert û zurûf nehiştin ez biçim dibistanê. Wê mamosta jin ji dayîka min re got bera were cem min li malê fêrî quranê bibe. Ez çûm cem mamosta xwe min quran demekê xitim kir. Min pir caran quran tev xwendiye. Quran giran e min zêde jê fam nedikir. Pir zaniyarên olê heta

niha baş jê fam nekirine ji ber ku tefsîra quranê giran e. Li gorî min bi melyonan kes dixwînin, lê jê fam nakin. Li gorî min ê ku quranê bixwîne divê jê fam bike, wexta jê fam bike divê di jiyana xwe û di nav civakê de pêk bîne.Ê bixwîne û di jiyana xwe de pêk neyine, bera nexwîne û gunehkar nebe .

Heta niha ew civakên ku dibêjin em misilman in tiştek ji quranê û misilmantiya xwe fam nekirine, ji ber zagonên quranê wekheviyê dixwaze, lê di zagonên dewletê de ev tişt nîn e . xweda em kurd xuliqandine, zimanê me kurdî ye, em kurd ji ezmanan ne hatine. Em ji bin erdê nehatine. Em jî mirov in, lê zimanê me û zihniyeta me bi kurdî ye, dewletên misilman dibêjin cî ji wer re nîn e, dewletên biyanî jî dibîjin cî ji wer re nîne. Ka misilmantiya Rojhilata Navîn û ka demoqratiya Ewrûpa. Heger cihan tev de qir bibe, tune bibe em ê bighêjin mafê xwe. Em zarokên mezobotamiya ne. Em derguşa şaristaniyê ne. Misilmanan digotin wê Mêhdiyê zeman rabe, va ye Mihdiyê zeman rabûye ew jî serok APO ye.

Heval Dirêhî û heval Mêhdî li bajêr dixwendin her ji bajêr dihatin malê hêz didan min alîkariya min pir dikirin, li ber min rûdiniştin û serê xwe bi min re pir dêşandin ji bo ez fêrî xwendinê bibim. Birayên min sê ji min biçûktir bûn , wan jî alîkariya min dikirin. Me bi hev re xwend heta ew gihaştin refa heftan û ew jî çûn bajêr. Ji ber xwestekên min pir hebû min xwe fêr kir, lê di wê demê de min nizanîbû ku xwendin çi fêde dide mirovan yan yê bixwîne zana dibe û zihniyeta wan li pêş dikeve. Di gundê me de, dema zarokên wekî min diçûn dibistanê. Ez ji wan pir diqeherîm. Min timî digot ma qeyî ew ji min çêtirn. Min li wan

dinêrî pênûs, jêbir û lênûsên wan hebûn. xwe amade dikirin û bi kêfxweşî diçûn dibistanê. Ez ji xwe re difikirîm û min digot, çima min ji her du birayên min mezintir di nifûsê de qeyîd kirine. Dema min didît zarok diçûn dibistanê dilê min bi min dişewitî, ez pir melûl dibûm. Min ev nakokî di jiyana xwe de pir jiyan dikirin, heta min xwe di malê de fêrî xwendin û nivisandinê kir û ez çûm mehwe omiyê jî û min quran xitimkir, ev hezkirineke min ji xwendinê re dide nîşandan. Min ji bo xwendinê şerekî pir dijwar bi malbat û civaka me yî kevneperest re kiriye. Ez dikarim bêjim ku min ji tunebûnê hebûn di kesê xwe de da çêkirin. heta wê demê ez ne di asta wê de bûm. Piştî ez tevlî partiyê bûn, Min nas kir ku çiqesî fêda xwendinê li min hebû. Yanî di zaroktiya xwe de dema min şerê malbatê dikir ez lê poşman nebûme. Ez heta niha jî difikirim bê çima min ewqasî îsrar dikir, belkî şensê min bû ku wê rojek were û fêda xwe li min hebe. Di gundê xwe de ez jî weke her keçeke kurd di nav malbata xwe de çi pêwîstiyî hebana min di malê de dikir. Min û xuşka xwe bi hev re kar dikir. Karê xuşka min hevîrê nanê tenurê û xwarin çêdikir. Karê minjî paqişkirina malê hewşe firax şiştinbû. Di gund de mala me pêşiya gund bû nêzîkî gir û ziftê bû. Bexçeke me yê tirî hebû mala me di orta rezê tirî debû. Derdorî  dused darên me yên tirî hebûn. Derdora hewşa me tev şinkayî bû. Em hîn çênebûbûn bavê min ew bexçe çêkiribû, despêkê bavê min tê de dixebitî. Pir lê miqate bû, Piştî bavê min mir em tev de tê de dixebitîn. Heval Dirêhî û Mêhdî û birayê min (M) û (B) li bajêr dixwendin. Piranî ez li bexçe miqate bûm. pirê caran gundiyan jî alikariya me dikirin. Dema birayên min dihatin gund me tev de di nav bexçe de kar dikir. Merivên me jî carnina dihatin aliyêkariya me dikirn, mala

me ji her kesî re vekirî bû kî diçû û dihat ji wî tirî dixwar,me tucarî ji wî rezî ne tirî û ne pelên mêwa jê firotine. Di dawiyê de ew rezê me nema çêbû tev xera bû. Min di destpêkê de jî da ye xuyakirin. Têkiliyên me, dayîk, xuşk û birayên min bi hev re baş bûn, me ji hev pir hez dikir. Birayên min xwendevan û pir zîrek bûn, pêşketîbûn û cihan hinekî nas dikirin. Tê bîra min hîn heval Mêhdî û heval Dirêhî refa nehan bûn pirtûkên dîrokî wek yê Mihemed Emîn Zekî, Markis Lînîn û li ser Gîvara dixwendin. Ev pirtûk li mala me hebûn. Birayên min wekî zihniyeta zilamê kevin nêzîkî me nedibû, digotin gerek keç çav vekirî bin û di nav civaka xwe de têkliyên wê xurt  bin. Ez weke keçeke di nav malbata xwe de mezin bûme, timî min digot divê ez li gorî terbiya malbatê tev bigerim. Di jiyana me her sê xuşkan de me çi jiyan kiriba me bi dayîka xwe re parve dikir, me tucarî tiştên nedirê de nedikir. Tiştek em jê bitirsiyana tune bû. Heval Mêhdî ji min re digot pir pirtûk di mala me de hene, çima tu naxwîne. Min ew pirtûk dixwendin, lê min tiştek jê fam nedikir. Min hinek tişt jê fam dikir, wekî pirtûka Markis Lînîn li ser min pir giran dihatin, lê pirtûkên li ser Givara û hin pitûkên çîrokan min fam dikirin. Ez pir aciz dibûm dema min wateya wê fam nadikir.Di şevên zivistanê yên dirêj de, bernameyeke min hebû min her şev dixwend û dema heval Mîhdî bihat malê, me bi hev re dixwend û ji min re peyv bi peyv bi kurdî şirove dikir. Timî ji min re digot ez naçim heta tu fêrî wergera kurdî bibe, tu fêrî xwendina erebû bû divê tu fêrî wergera kurdî jî bibe. Heval Mêhdî ez fêrî tîpên kurdî jî kirim. Hêdî hêdî min xwe fêr kir, dema kar heba min karê malê dikir û dema kar kêm ba min di ber re xwendina xwe dikir. Ji tîpan min xwe fêrî peyvan kir, ji peyvan min xwe

fêrî hevokan kir, ji hevokan ez fêrî mijarê bûm, heta ez baş fêrî nivîsê bûm. Min daye xuyanêkirin ku ez çiqasî zorleme dibûm heta ku min tişt pêk tanîn.

Ji zaroktiya xwe de heta min partî nas kir bi vî rengî min jiyana xwe berdewam dikir, ji pêvajoyekê derbasî pêvajoyeke din bûn.

# Di Sala 1985`an de Min Partî Nas Kir.



Bi rastî heta wê demê min nizanî çima ewqasî israra min ji bo xwendinê hebû. Bi sedê cara ez bi şev ranedizam. Heta ez gihaştim Armanca xwe. Ez niha dikevim ferqa wê de. Mirov dikare ji tunebûnê hebûnê çêke. Gava mirov ji Dil bixwaze mero dikare pir tiştan bike. Xwendin di şexê min de guhertineke bingehîn çêkir. Di sala 1985`an de heval hatin gundê me, wê demê heval qaçax bûn, salê carekê yan jî du carî dihatin gundê me. Heval Mêhdî bi wan re derbasî gundan dibûn, Di despêkê hevalên xort dihatin cem me, min baş nizanîbû çima ji wan re dibêjin heval. Heval Mêhdî ji me re li ser serok û PKK niqaş dikir. Hevalê Mêhdî ji me re got evana hevalên serok APO ne. pirê caran civîn ji xortan re li mala me çêdikirin. Nîqaşên wan li ser kurd , kurdistan û li ser serok Apo bûn. Heval Mêhdî li ser armanca serok Apo ji PKK` ê  bi me re pir nîqaş dikir. Em çend Keçên ku heval Mêhdî me nas dikirin, ji me re jî civîn çedikir. Wê demê hîn neçûbû Ekademiya Mahsûm qorqemaz, kar di herêmê de dikir, xwe ji kar re vala kiribû. Her şev pirtûka Berxwedan Jiyan e ji me re dixwen û bi kurdî ji me re şirov dikir, li ser berxwedana hevalan di zindana Amedê û li ser heval Mezlûm xeyrî, kemal pîr û Heqî qerar ji me re pir nîqaş dikir. Heval dihatin cem me, lê kêm bûn û pir dereng dihatin, naskirina me ji partî re di rêya heval Mêhdî re bû. em timî bi hezkirineke mezin nêzî serok Apo û Pkk`ê dibûn. Hêdî hedî heval li gund zêdetir bûn û hevalên jin jî dihatin gund û civîn ji jinan re çêdikirin. Ez û keça xaltika xwe bi hevalên jin re derbasî malan dibûn. Dema heval Mêhdî tevlî PKK` ê bû û çû ekademiya Masûm Qorqemaz, min nizanîbû keç jî tevlî PKK` ê dibin. Piştî min heval Bêrîvan dît ez ketim ferqa ku keç jî tevlî PKK` ê dibin.

Min heval Bêrîvan carekê dît, paşê çû çiyê. Di destpêkê de min di gund de kar kir. Ez pir bi serok Apo, Pkk`ê, berxwedana zindanan û bi heval Mêhdî û Bêrîvan bandor bûbûm û heval Rûken jî şevekê li cem me ma paşê ew jî çû çiyê. Min biryara xwe da ku ez tevlî partiyê bibim. Di sala 1988`an de ez qerarlî bûm, min pir israr dikir ji bo ez tevlî partî bibim, lê hevalan wê demê qebûl nedikirin û digotin heval Mêhdî nih tevlî bûye û ji bo yadê em te nabin. Dema heval Bêrîvan şehîd ket min pir israr kir ez tevlî bibim. Min dev ji jiyana xwe ya kevin berda û min digot divê ez jî wekî hevalên keç tevlî partî bibim. Ez bi rengekî hestiyarî bi partî, berxwedanan û neteslîmiyet heta gihaştina şehadetê ve hatibûm girêdan. Heval Mêhdî li ser jiyana serok Apo ku çawa dest bi avakirina Pkk` ê kiriye daxivî û serok Apo di zanîngehê de dest bi vî karî kiriye. Serok Apo ew ê ku ji tunebûnê hebûn çêkir. Serok Apo û çend hevalên wî yên despêkê ev kar kirine. Digot pir heval hatin girtin, pir heval şehîd ketin heta Pkk` ê gihaşt vê astê. Min navê Pkk`ê dibihîst, lê me jê fam nedikir, heta dema hevalan ji me re civîn çedikir, em zû tê nedigihaştin. Tevgerek di nav me de çêdibû. Em çend keçên di gund de me dixwest zû hevalan bibînin. Heval Mêhdî çû ekademiyê kes tune bû şûna wî dagire. Her heval dihatin min ji wan re digot çima hûn zû nayên, hûn dereng dimînin. Di wê demê de di aliyê rêxistinî hin xwe komî ser hev nekiribûn, bê bername tevger dikirin, bi taybet di aliyê gundan de kengî kêfa wan bixwestana dihatin. Em gurûpek keç her heftî carekê dihatin cem hev, me ji xwe re kovara Dengê Kurdistan û Berxwedan jiyan e dixwend. Dengê Kurdistan gurûba heval Bêrîvan li ser bû.Piştî heval Mêhdî çû me gurûpa xwe bi rê ve dibir, me çiqasî

ji hevalan re digot werin di gurûpa me de amade bibin nedihatin. Wê demê em pir gerim û kêfxweş bûn, ji wê gurûpa me em çar kes qerarlî bûn. Ez dibêjim gurûpa me salekê perwerde meşand, heval tenê sê-car caran di perwerda me de amade bûn. Ez û keça xaltîka min me di gunde kar dikir. Me alîkarî kom dikir, pirtûk belav dikirin û me milet ji bo civînan kom dikirin. Hevalan ez pir êşandim heta ez tevlî partî bûm. Digotin ji mala we heval mêhdî tevlê bûye, ji mala we ev sê dixwazin tevlî bibin, em ji bo dayîka te niha te tevlî nakin û heger tu tevlî  bibe wê kî di gund de kar bike. Ez bi hevalan re heta gundên derdora me jî digeriyam. Hevala karên gundê me û karên gundên din jî bi min dikirin. Di dawiyê ez tanîm malê, me jî nizanîbû me digot partî  çi ji me re bêje em ê bikin. Gundê me tev ne dostê partiyê bû nêzîkî sih mal dost bûn. Me dengê kurdistan derbasî van malan tevan dikir. Deng hejmara duyan bû ê wêneyê hevala Bêrîvan li ser bû, ew deng li nav wan malan tevan hate xwendin. Di sala 1988`an de min di gund de kar dikir. Ez diçûm gundê nêzî gundê me ji bo ez alîkariyê kom bikim, em diçûn baleyê yan digotin karê tewhî me ji partiyê re jî dikir, me ji hevalan bêhtir kar dikir, ew jî ji rêxistinkirina gurûpa me bû. Me bi rengekî sîstemî perwerdeya xwe bi rê ve dibir. Hîn di herême de xebata partiyê ne ewqasî rêxistinkiribû. Ji wê gurûpa me, em penc kes tevlî partiyê bûn, du ji wan partiyê ew rêkirin male, em sê kes man, yek vê dawiyê reviya. Heval Gulistan li Zapê şehîd ket. Ji sala 1988`an de min biryara xwe da. Min kar di nav gundan de dikir heta sala 1991`ê ez bi zora xwe tevlî partiyê bûm. Bila kes nebêje me heval Dîrok tevlî partiyê kiriye, ez bi xwe tevlî bûm. Ez keda dayîka xwe ji bîr nakim wê ez tevî partiyê kirim, carekê ji hevalan pir aciz bû,

sibehekê hîn em di xew de bûn çû Amûdê û ji Amûdê çû Qamişlo û bi berpirsiyarên li ser Amûdê û Qamişlo disekinin re şer kir. Ji wan re got çima hûn li zarokên min wisa dikin, min mala xwe ji partiyê re vekir ku hûn ne bi vî rengî nêzî zarokên min bibin, keça min ev çar sal dixwaze tevlî partiyê bibe, çima hûn li pêşiya wê dibin engel, ez dizanim hûn ji bo min dibêjin, ji ber ez jî dayîk im û bi tevlîbûna keça min re dibe sê zarokên min tevlî partiyê dibin, ez rê li pêşiya wan vedikim û ez ji ber vê tevlîbûna wan serbilind im, heger ji bo min be ez dibêjim ber keça min fedayî serok Apo û şoreşê be, ez dayîk im û ji bo her sê zarokên xwe serkeftinê dixwaz im. Bû êvar hat malê me nizanîbû ew çûyê ku heta ji min re got ez çûbûm Amûdê û Qamişlo û min bi berpirsiyarên eyaletê re şer kir ji bo tu tevlî bibe, wê sibe werin te bibin. Bi rastî dayîka min ev gav avêt. Her kes ji dayîka min re digot dayîka şêra ye. Ez tu carî bê hurmet nêzî heval û partiyê nebûme. Min deyneke pir mezin dida dayîka xwe, min timî digot dayîka du hevalan e. Zehmet bû heta wê ji ber xwe ve ji min re got here. Min dayîka xwe baş nas dikir, min zanîbû wê ew ji min re bêje here tevlî partiyê bibe, şîrê min li te helal be, lê min nizanîbû wê ji min re bêje tu ji mala min derket û tevlî partiyê bû veger tune ye, Tu derkeve ji derveyî xeta partiyê û tu di heqê partiyê de sûcekê bike, ez nahêlim partî hesab ji te bixwaze, ez ê bi destên xwe te bikûjim. Ev gotinên wê tu caran nayên jibîrkirin. Di sala 1991`ê de ez fermî ji mal qut bûm û tevlî partiyê bûm. Di despêkê de me tu perwerde nedîtin, me dengê kurdistan, pirtûkên serokatî, belgên partiyê û belavok dixwedin, wek tecrûbeya yekê min xebat di navçeya Amûdê de meşand. Min xebat li gund û bajarê Amûdê tev dikir. Ez pir heyecan dibûm. Tiştê min di

jiyana xwe de dixwest pêk hat. Ez tevlî partiyê bûm gava min a yekem ew bû, ya duwem ez serokatî bibînim. Di wê dema ku me xebat di herêmê de dimeşand, partî şehîd di herêmê de îlan kirin. Di nav şehîdan de heval Mêhdî ji hebû. Di sala 1993` yan de heval Mêhdî navê tevgerî Dilovan şehîd ket, yazde  rojan gel dihatin ji bo merasîmê şehîdan. Partî merasîmê heval Mêhdî û heval Ahmed bi hev re çêkir, li gundê me li pêşiya mala me. Gel pir hatin merasîm û bername ji aliyê partiyê ve hatibû amadekirin û tev hate pêşkêşkirin. Min li ser jiyana heval Mêhdî axaftin kir. Ji ber dengê dayîka min tune bû. Li pêşiya gel di kêliya min ew axaftin kir û min ji gel re gotinên wê gotin, ew sekin bi min pir zor bû. Dema ez li şûna wê axivîm û min got çawa dayîkek nikaribe li pêşiya gêlê xwe bi dengekî bilin di merasîmê kurê xwe de baxive û xwe îfade bike, ez û milet tev êşiyan. Ji ber axatinên wê pir bi şewat û bandor bûn milet deh rojan dihatin mala me. Bi axaftin û nîqaşên berfireh ew merasîm bandoreke pir mezin li ser gund û herêmê kir. Piştî merasîmê min xebata herêmê meşand heta heyva yekê ji sala 1994`an de,paşê ez çû mala serokatî li Helebê. Em şeş hevalên keç bûn. Me jiyaneke pir xweş bi serokatî re derbas kir.

## Jiyana Min Bi Serokatî Re

Em gurûpek hevalên keç bûn. Em heft heyvan li cem serokatî man. Me jiyaneke pir xweş bi serokatî re derbas kir. Em şeş hevalên keç bûn. Du şehîd ketin, du reviyan, em man du di nav partiyê de. Em li mala serok bûn, mala wî mezrehak û vêlak sê qat pir mezin bû. Tev dar, gul û şinkayî bû mesbeha avê jî hebû. Ji ber demeke dirêj kes derbasî malê nebûbû, bexçe hemû gemar bû, me pazde rojan tê de kar kir. Gurûpa me cara yekê ye ku serok bibîne. Me nizanîbû wê serok were heya carekê heval Ozgûr hat ji me re got em ê herderê paqij bikin, ji ber serok wê were cem me. Em ketin heyecaneke pir mezin, me herder paqij kir hîn me bidawî nekiribû serok hat. Derbas bû em tev sekinîn û got çima ev bexçe ne paqije û silav li me tevan kir, em tev çûn rûwê wî û derbasî malê bû. Ji kêf û heyecanê me nizanîbû çi bikira. Cara yekê bû serok ji me re civîn çêdikir. Bi turkî axivî û me tişte jê fam nekir, lê heval Ozgûr tev nivîsand û ji me re werger kir. Bû roja din serokatî çû Helebê û civîn ji heval, xebatkar û ji milet re çêkir. Me nizanîbû çi çêbûye, dema Serok vegeriya malê aciz bû, hat xwaringehê û got kanî pîvazekê, bacan, bexdûnis û perçak nan. Me jê re anî, pîvaz bi destê xwe şkenand û tev bacan û bexdûnis xist nav nan û xwar û ji me re digot hevalên me bûne wek axa xwarineke taybet ji milet dixwazin, dibêjin em vê naxun û em ê vê bixun. Ev çi ye, me Pkk`ê ji tunebûnê çêkir, me wek derziya tu bîrekê bikole heya em gihan vê astê, me xwe bi nan û pîvazê anî vê astê, em bi vî rengî mezin bûn, niha hevalên me diçin nav gel û dibêji em vê dixun û em vê naxun. Ev ne ruhê şoreşgertiyê ye, ne jî ruhê Pkk`ê ye, aciz

bû û got divê hûn ruhê Pkk`ê ê despêkê temsîl bikin. Dunya bû êvar hevalên berpirsiyarên eyaleta Helebê hatin, serokatî li xwaringehê telîl çêkir, hemû hevalên eyaletê amade bûn, bi turkî axivîn û dest bi nîqaşên pirsgirêkên rêxistinî kirin. Hin pirsgirêk di duzeya sucdene derketin, çima mudaxele bi rengekî rêxistinî jê re nayê çêkirin. Got çima ewqas kesên sorinkêş we ew tevlî partiyê kirine, çima hûn axetiyê li ser gel dikin. Dest bi xeberan kir, çi hat ber devê wî ji hevalan re got, serokatî pir aciz bûbû û pir hişk bi ser hevalên berpirsiyarên Eyaletê de çû, rexneyên pir hişk li wan kir. Em wê şevê ranezan me nizanîbû çi heye. Cara yekê ye em serokatî wilo aciz dibînin. Ew şev derbasbû, bû roja din serokatî hat cem me li belkonê rûnişt. Ji me re got ka meyvan bînin. Mey vexwar û ji me re got, min pir rexne li berpirsiyarên we kir, ji bo li ser xwe bisekinin, milet wan rexne dikin û li ser xwe nasekinin, ji xwe re çend malên taybet dîtine, ji wan malan dernakevin, li malên xweş û xwarina xweş digerin, hevalên berpirsiyar û tevlî kadiro bûne bela li ser serê me û gel, cidî nêzî karên xwe nabin. Li ser xwe nasekinin, gihiştine kî ker, kor, lal, seqet, diz û serserî anîne nav Pkk`ê ,ev çi kadrone wan tevan bişînin malên wan bi kêrî tiştekî nayên. Pir keç jî ji malên xwe hatin tevlî me bûne çixara vedixun û panterona li xwe dikin, li mala bavê xwe çixare veneduxwarin û panteron li xwe nedikirin. Em ê nîvê van kadiroyan bişînin malên wan, pirisgirêkan pir derdixînin. Ji me re got binêrin heval, heger hûn jî wekî wan bin ji niha ve em ê we bişînin malê.

## Xwarina Me bi Serokatî re

Rojekê serokatî xwest em hemû hevalên keç pê re xwarinê bixun. Cara yekê bû me bi serokatî re xwarin dixwar, em ketin heycanê û me nizanîbû em ê çawa xwarinê bi serokatî re bixun. Ji me re got kerm bikin û me dest bi xwarinê kir. Îsotên tûj li ber xwarinê hebûn. Serkatî got kî ji we dikare îsota tûj bixwe, deng ji me kesî derneket. Serokatî ew îsotên tûj xwar û rahişt yekê da heval Ozgûr û got bixwe. Heval Ozgûr îsot xwar û sor bû hêsirên wê herikîn. Îsot pir tûj bû, lê wê çawa bike, wê bixwe. Serokatî keniya û got binêrin ez çawa dihêlim ku merov bigirî, hûn nikarin îsoteke tûj bixun, hûn ê çawa herin çiyê. Hûn ê li çiyê çawa debar bikin.

## Xewa Me

Rojekê serokatî derbasî odeya ku me lê xew dikir bû û got hevalên me nizanin xew bikin. Ode teng bû têra me nedikir. Got ev vêla fireh we xwe di hundirê vê odê de fetisandiye, derkevin belkonê, salonê û ji der ve, we çima xwe di vir de fetsandiye, çima hûn mejiyê xwe naxebitînin. Axaftin li ser kesayetê kir ku çawa yek kesayeta xwe li pêş bixe, xwe birêxistin bike û çawa bernamê xwe çêbike û guhertinê di kesayeta xwe de pêk bîne.

## Serokatî Û Xweza

Ez di nav bexçe de bûm, min gul av didan, ji nişkave serokatî li cem min sekinî û got çima ev gul tev çilmisî û hişk bûne, çima hûn li bexçe û li gulan xwedî dernakevin. Divê hûn bexçe paqij bikin,av bibin, ber dar û gulan xweş bikin, ev şeş heyvin kese tê de nexebitiye, ne heval ne jî dergevan li vî bexçî miqatene ji ber wê em heyvekê di bexçe de xebitîn, me tev kola û paqij kir, dar kesxand , gul çandin û me giha jî birî. Hêdî hêdî bexçê me şîn û xweşk bû. Hefteyekê em di bînayetê de xebitîn heta me paqij kir, bînayet sê qat bû, me sê rojan jî hawiz paqij dikir. Ew darên tirî û behîvan tevî gul û giha, heta serokatî cardin hat tev şîn bibûn. Mero nedixwest ji malê derkeve ji ber ku bêhna mirov lê fireh dibû

## Bernameya Me di Malê de

Destpêka serokatî hat bername ji me re çêkir, perwerde û xwendin me diyar bû, heyvekê me Dîroka partiyê bir, jê û şûn ve me her kesî ji xwe re dixwend û dinivîsand. Perwerda me xwendin bû ji bo ku em kurahiya pirtûkên serok û dîrokê fam bikin, me pir pirtûk xwendin û li ser nîqaş kirin. Di wê demê de heval Birîtan şehîd ketibû. Di nava partiyê de avakirina artêşa jinê cara yekê hatibû damezirandin. Me pirtûka li ser avakirina artêş jinê  xwend û nîqaş kir. Pirtûka serokatî (çawa em ê bijîn) me dixwend û niqaş dikir, me li gorî zanebûna xwe nîqaş dikir. Cara yekemîn bû ku ez di nav partiyê de perwerdê dibînim. Belkî hevalên din sê heyvan perwerdê dîtibûn û di bajaran de kar kiribûn û pir pirtûk jî xwendibûn. Ji bo ku ez ji cîhanekê çûbûm cîhaneke din min bawer nedikir ku ez li mala serokatî me û li cem serokatî perwerdê dibînim. Min hêzeke pir mezin ji serokatî digirt. Min timî ji xwe re digot birastî ez li cem serok im yan ev xewn e, ez dîsa li xwe vedigeriyam min digot na ev rastî ye. Me bi serokatî re gogê dilîst û me bi hev re sipor dikir. Serokatî pir caran bi me re xwarin dixwar. Carekê ez çûm cem hawizê av ji bo ku gulan av bidim, ji nişka ve serokatî li cem min sekinî, ez ketim heycanekê û ji min re got heval nekeve heycanê, we bexçe hinekî paqij kiriye, lê çima gulên we çilmisîne, ber wan xweş paqij bikin ji bo şîn bibin, ji ber ku şînkayî jin e û jin jiyanê çêdike. Jinê şînkayî afirandiye, divê jin li şînkayî xwedî derkeve, serokatî li ser jin û rengê jinê axivî, serok nedixwest jin ji wî rengê xwe derkeve, lewma ji min re got keziyên te keziyên jina kurd ya esîle li wan miqatebe û gotinên xwe berdewam kir

û got heval hûn niha dixwînin, niqaş dikin, qîmetê xwendin zanbin, her hevalek me bi serê xwe romaneke, her hevalek me dikare romanekê binivîse, li min nêrî û ji min re got ev keziyên te keziyên jina kurd ya resene, dîsa got hawiz pak bikin ji bo em tê de melevaniyê bikin.

## Bernameya Me ji bo Paqijkirina Malê, Bexçe û Mitbexê.

Bernameya me ji bo mitbexê roja yekê ji me dibû guravlî, xwarin ji bo hevalan çêdikir. Rojbaş seat şeş bû, me sipor dikir, paşê guravlî diçû metbexê. Me hevalên din bexçe paqj dikir û hevalek jî guraliyê paqijkirina hundir bû. Bernamê me amade û bi dîwar ve bû. Me her kesî karê xwe zanîbû. Di nav bexçe de meywê tirî, hinar, bihîv û pir tiştên din jî hebûn. Bexçe tev paqij û şîn bû. Dûrketina ji mala serok pir zor bû.

## Em Li Nav Bexçe Bûn


Em her şeş hevalên keç di nav bexçe de bûn. Serok derket em dîtin û hat cem me û got hûn çi dikin. Serok li ser nirxan axivî û niqaş kir, nirx çi ye, mirov çawa nirxan biparêze, mirov divê îhtîmada xwe bide ser xwe, çawa ji tunebûnê dikare hebûnê çêke, weke Pkk`ê ji sifirê dest pê kir, îro gihaştiye vî nirxê mezin, hevalên me tev bi nirxin. Bi ked û xwîna xwe em gihandine vî nirxê herî mezin,her hevalek û şehîdek nirxê herî mezin, divê mirov xwedî li vî nirxî derkeve. Ev mal û bexçe bi keda heval, milet û şehîdan hatiye, divê em xwedî lê derkevin, divê hûn nirxê kedê zanibin û ruhê apoçtî , Pkk` ê û alîkarî di kesê xwe de bidin avakirin, heger hûn bi vî ruhî nêz nebin hûn nikarin di nav Pkk` ê de jiyan bikin. Di dawî de got werin em tev bi gogê bilîzin, heta êvarî me û serokatî bi gogê lîst. Careke din jî ji ber serok dixwest hêzên jinên nû yên ku tevlî bûne nas bike hin tişt ji me dixwest, yek ji wan xwestekan bû ku ji hevalekê re got bi darê ve hilkişe û hinek behîv ji min re bîne, dar pir zirav bûn, tu kes nediwêrî pê ve hilkişe, lê ew heval hilkişiya û behîv rakirin.

## Berî Serok Here

Serokatî berî here bi me tevan re nîqaş kir û got ev demeke hûn li cem min perwerdê dibînin, we pir xwendin û nîqaş kiriye, nîqaşên we jî gereke di aliyê kesayetî de pir hatibe kirin, ji niha û şûn ve hûn ê di aliyê kesayetî de xwe çawa li pêş bixînin ji ber ku dema hûn biçin çiyê, hûn ê çawa nêzî piratîkê bibin, divê têgihiştên di piratîkê de derdikevin zû fam bikin û derxînin asta zanebûnê, tiştên we ji perwerdeya serokatî famkiriyê derbasî çiyê bikin, pir bi hevalan re nîqaş bikin û got hûn karin biçin çiyê û barên wê rakin? Me teva got em amadene. Me nizanîbû serokatî çawa difikire. Me xwe ji bo çûna çiyê amadekiribû. Her cara serok dihat malê heval Ozgûr jî dihat malê. Heval Ozgûr bi eslê xwe turk bû û şehîd ketiye. Di wê demê de hin pirsgirêk di navbera me û Qutên Başûr de derketibûn, di dawiyê de serok em neşandin çiyê û got pêwîstiya kar bi we heye, em ê we bişînin nav kar û xebatê ji ber ku pir pirsgirek derketin û ji me re got me pir kes şandin malên wan, em qebûl nakin kesên qerarsiz di nav me de bimînin, ev kesên wisa bi jiyana me dilîzin, tu kesên wisa nikarin di nav Pkk`ê de jiyan bikin. Serokatî me tevan şandin eyaleta Helebê. Ez çûm Efrînê û hevalên din jî li Helebê man.

## Serokatî Xatir Xwestin

Serokatî di xatir xwestinê de li ser pêşketin û pêşxistina kesayetê axivî û got, heger hûn xwe li ser vî esasî pêş bixin hûn ê biçin çiyê. Em tev li ser piyan sekinî bûn, serokatî ji hevalekê re got mêşek li ser rûwê te ye bikûje, wê hevalê şiqam li rûwê xwe da, serokatî keniya û got binêrin ez çawa dihêlim mirov şiqamê li xwe xîne. Got serkeftin ji we re û derket hewşê. Em li dû çûn, xatir ji me yek bi yek xwest û ji malê derket û bi meşê çû. Em tev çûn ser vêlê me lê dinerî, çiqas bi me giran û zor bû. Em tev giriyan. Me lênerî dora kîlo mitirekê meşiyabû, şifêrê wî jî li dû wî hêdî hêdî dimeşiya, bûbû êvar ji ber çavên me winda bû. Em tev ji ser xanî daketin û piştî du rojên din hevalan gotin xwe amade bikin em herin.



# Em Çûn Nav Kar



Em çûn nav kar. Ew heval tev çûn Heleb, lê ez çûm Efrînê, min sal û du heyvan li Efrînê xebat kir ji bo min tecrûbeyek mezin bû. Cara yekê bû ku ez diçûm herêmek cûda, di aliyê taybetmendiyên ziman û famkirinê de min zehmetî pir kişandin. Ji sala 1991`ê heya dawiya 1994`an min di herêma xwe de xebat meşandibû, ji bo min derfetek nû bû ji ber ez ket ferqa taybetmendiya xwe û wan de. Wê demê min şer bi kesayeta xwe re dikir û li ser xwe sekinîm. Ez berpirsiyara bajêr bûm û min xebat dimeşand. Min ji Efrîn, milet û erdinîgariya wê pir hez kir. Efrîn tev çiya, dar û şinkayî bû, cudahiya Efrîn û çiyê tune bû , Ji bo perwerdê ez derbasî gelek gundan jî bûm. Ew hevalên ku sê heyvan perwerde didîtin,derbasî çiyê û nav xebatê dibûn. Bîranînên me li Efrînê jî ev in. Dema mirov li nav xwezaya wê digeriya naxwaze ji nav derkeve. Ez û gel zû bi hev re bûn yek. Paşê ez ji Efrînê çûm kobanê.

## Ez Çûm Kobanê

Demekê min li Kobûnê  kar kir. Erdinîgariya Kobanê deşt e û bi taybetmendiyê cuda ne û pir fewdal in. Her ku mirov cihê karê xwe biguhere baş e, ji ber her herêmek ne wekî ya din e. Min li rojavayê  kurdistanê tev xebat kiriye, min wekî miletê Kobanê fedekar û comerd nedît. Min pir li Kobanê dom nekir ji ber ez hatim girtin, dema ez hatim girtin ez li mala şehîd Rûken bûm, tenê ez şeş  heyvan li Kobanê mam.

## Girtina Min Û Jiyana Zindanê

Dema ez hatim girtin heftiyekê li Minbic û Helebê mam, paşê min rakirin Şamê frihê filestîn, min derbasî qawîşa jinan kirin. Pazdeh jin di qawîşê de hebûn, şeş ji wan kurd bûn, yek dayîk bû, du jî hevalên me bûn. Bû sibe min birin lêpirsînê, min got ez erebî nizanim, dîsa min daxistin qawîşê heya hefteyekê ez mam, dîsa min birin lêpirsînê, lê vê carê yekî kurd anîbûn ji bo wergera axaftinên min bike. Dîsa min vegerandin qawîşê û piştî hefteyekê yenê rêbaz û lêpirsîn bi min re kirin, di dawiyê de min besimand û min vegerandin qawîşê. Piştî sê heyvan birîna hukmê salekê ji min re gotin. Di wê salê de pir jin anîn zindanê û derxistin, min pir bi wan jinan re nîqaş dikir. Piraniya wan dayîk bûn bi ceza û demên cuda cuda derdiketin, piraniya wan jî siyasî bûn, di salekê de me pir nîqaş kirin. Em dibin erdê de bûn hivde derence em hildikişiyan heta em derdiketin derve, heftiyê carekê me derdixistin. Carekê me sê heyvan dernexistin derve, em tev nexweş ketin, lewam ji neçarî me derxistin bêhnvedanê. Di germê de me êvarî derdixistin, lê dema dunya sar dibû me nîvro derdixistin. Jinan pir alîkariya hev dikirin. Pirtûk û radiyo qedexe bûn, tenê quran li cem me hebû me dixwend. Carekê ji me re pirtûkek bi dizî hat,pirtûk roman bûn. Di salekê de me hemû cejn û rojên xwe yên dîrokî di zindanê de pîroz kirin, bi nîqaş stran û çepik û dîlan me pîroz kirin. Ji heyva şeşan di 1996`an de heta heyva şeşan di 1997`an de ez di zindanê de mam. Me ser dîroka cîhanê, kurdan û ya Pkk nîqaş dikir, nîqaşên me yê herî zêde li ser Berxwedana zindana Amedê bû. Me timî digot hevalên destpêkê teslîmkarî li ser xwe qebûl nekirine,

gereke em timî wan bibîr bînin, me tim ji xwe re digot divê jiyana me di zindanê de xerab nebe, divê em neyên hilandin û moralê me nekeve. Dayîka şehîdekî jî li cem me di zindanê de bû. Dayîka şeş zarokan bû û dayîka Reşîd ew jî di nav xebata me de hatibû girtin, ew dayîk pir êşiya bû, salekê hukim lê hatbû birîn. Wê dayîk berxwedaneke pir dijwar kişand, ji ber ku zarokên xwe salekê nedidît. Girêdana wê bi partiyê re pir xurt bû. Ew di zindanê de ji me re dayîk û heval bû, Ji bo me pir diqeherî û digiriya û li aliyeke din bêhna wê bi me fireh dibû, me bi qasî wê zehmetî nedît,piştî pênc heyvan ji lêpirsînê hin kes hatin û lêpirsîna wê disa vegerandin, lê dîsa dayîk qehreman û pir ber xwe da. Tucarî ez wê dayîkê ji bîr nakim. Dayîka min ya yekemîn Kurdistan e, ya duwemîm a min anîye cîhanê, ya sêyemîn Ca Reşîd e. Dayîkên şehîdan tev dayîkên me ne. Di salêkê de hemû zehmetiyên zindanê bi alîkarî, moraldayîn û bi hezkirina Ca Reşîd û dayîkên din me desbas kir. Girêdaneke me pir xurt hebûn ji ber ku me nedixwest dijmin moralê me bişkîne. Sala Ca Reşîd qediya, me ew bi stran,çepik,dîlan û bi kêfxweşiyeke pir mezin bi rê kir. Girtin zor e, were tu salekê di nav çar dîwaran de bimîne. Di salekê di nav Pkk`ê de çi pêş ketin çêdibû min nizanîbû, timî min ji xwe re digot eceba pêşketin heye yan na. Carnan ez aciz dibûm, lê min ji xwe re digot gerek ez tucarî aciz nebim, kadroyên Pkk`ê hemû tengaviyên xwe bi fadekarî derbas dikin, lewam ez çiqasî tengav bibama min di jiyana xwe de nedida xuyakirin û min li ber xwe dida. Salek ji temenê me di zindanê de derbas bû, ew jî perçeyek ji jiyana min di nav Pkk` ê de ye, ez nepoşman im. Roja derketina min ji zindanê min xatir ji dayîkan xwest û derketim. Dayîkekê ji min

re got heqê rêya xwe ji rêveberê zindanê bistîne û min ew jin tev li pey xwe hiştin û derketim. Min nasnameya xwe girt û ji min re gotin tu rê nas dikî, min got erê lê min bighînin geracê. Min birin geracê û min kerteke Helebê qut kir. Li Helebê ez çûm malekê min got ,min bibin mala şehîd Zekiya, dayîkekê ez birim. dema ez derbas bûm min dît ku dayîka şehîd Zekiya nexweş e, li wir bavê şehîd Zekiya li ser demê çi heye çi tune ye dest bi nîqaş kir. Min got bavo, dayê ez nizanim, ez îro ji zindana şamê derketime û hatime cem we. Dayîka şehîd Zekiya ji min re got tu çûye cem dayîka xwe? Min got tu dayîka min î, ez xistim hemêza xwe û giriya. Min ji wan xwest ku êvarî min bibin cem ca Reşîd. Bû êvar tirimpêl anîn û min birin cem ca Reşîd, min ca Reşîd dît û me xwe avêt hemêza hev û bi ser hev de giriyan. Ez wê şevê li cem wê man, me ji hev re nîqaş kir, me bîranînê xwe ên zindanê gotin. Wê şevê ez li hevalan geriyam bi telefûnên malan min zû heval dîtin. Bû sibe ez û ca Reşîd çûn cem hevalan, hevala bawer nedikirin ku ez ji zindanê derketime, ji ber ku wan ji nişkave min dîtin.Wê rojê heval bi serok re axivîn, serok got bila here malbatê bibîne paşê wê bişînin cem me. Ez dîsa vegeriyam cem ca Reşîd û em bi hev re çûn Cizîrê. Malbata min piştî pênc heyvên min di zindanê de çêbû nû hevala ji wan re gotin ez hatime girtin, lê nedigotin ez di kîjan zindanê de me, her dayîka min dipirsî digotin em nizanin. Hevalan zanîbûn ez li Şamê, li firhê Felestin im, lê ji wan re rastî nedigotin. Heta ez derketim û çûm cem wan. Me malbat dît û rewşa wan baş bû, em deh rojan li cem malbatê man û em li gund, bajarê Hesekê, Amûdê û Dirbêsiyê geriyan. Piştî deh rojan me xatir ji wan xwest û em vegeriyan Helebê. Li cem hevalan ez tevlî pîrozbahiya 30`yê  Hizêranê bûm. Paşê

ez li Efrîn, keleha Semhanê, Basûtê û li pir gundan ez geriyam. Dîsa ez vegeriyam Helebê û demeke kin lê mam.

## Ez Li Qampê Bûm

Di yakê heyva heftan de ez çû qampa Şamê. Li wir dibistaneke kurdî perwerdeya wê serokatî dida hebû . hevalan min derbasî dibistanê kirin û ji min re gotin bi hevalan re amade be wê niha serokatî perwerdê bide. Çawa ez rûniştim serokatî derbasî nav hevalan bû. Dest bi axaftina li ser pirtûka Welat bi taybet ya Zaxrosê kir. Dema min serok dît, ez çûm cîhaneke din. Piştî me perwerde bi dawî kir, hevalan tev hatin silav li mindan. Ji bo min dîtina hevalan û serokatî nirxekî pir mezin bû. Hevalan ji min re gotin wê niha gazî te bikin, ji bo hûn xwarinê bi serok re bixun. Hinek mêvan hebûn ew jî hatin bi serok re xwarin xwarin. Em tev sekinîn û me silav dan serokatî, ez mam dawî û min silav da serokatî. Serokatî ez kişandim û hate rûwê min, hevalan jî wêneyên me kişandin, heta niha jî ew wêne heye. Serok bi mêvanan re daxivî û xwarin dixwar û di dawiyê de got ev hevala me ya zindanê ye? Hevalan got rast e serokê me, li min nêrî û got heval tu hevala me ya nû ji zindanê derketiye, min got rast e. Serok pir pirs ji min kirin wek, tu li ku derê hatî girtin, çiqasî di zindanê de ma, we çawa zindan tehmûl û debas kir, di lêpirsînê de çi ji we dipirsîn û we çi bersiv dida û çi bandor li te kir? Min jî bersivên serok yek bi yek bi kurtasî dida, lê ya ez li ser sekinîm we pirsên ku di lêpirsînê de ji me dihat pirsîn. Min ji serok û mêvana re diyar kir ku hemû pirsên wa li ser Pkk`ê û şerê wê bû. Serok got xuyaye we pir berxwedaye, ez du rojan tenê di wê zindanê de mam min tehmûl nekir, wextî ez biteqiyama û gotinên xwe berdewam kir û got zindan Kesayetan xurt dike, gelek heval ji zindana qehreman derketine, zindan Kesayetê Fêrî

gelek tiştan dike. Rûh, fikir û îradê pir xurt dike, we di zindanê de tecrûbe girtiye, gereke hûn jiyana xwe ya zindanê bi hevalan re bidin nas kirin. Piştî me xwarin qedand, ez çûm cem hevalan û pir heycanlî bûm. Xeyalên min çûbû cîhaneke din, min ji xwe re digot ev xewin e yan jî rastî ye. Min qet bawer nedikir ku ez ji zindanê derkevim û careke de serok û heavalan bibînim. Salekê ez ji hemû pêşketinên partiyê qut bûbûm, ji bo min pir zor bû. Dema min serok careke din dît, ruh li min vegeriya û moralên min bilid bûn ku ez di nav hevalan de pir kêfxweş û canlî bûm. Pir hevalên kevin yên ji çiyê hatibûn li ekedimiyê bûn. Perweda me bi wan pir xurt bû. Ez derbasî perwerdê û jiyana hevalan bûm, serok hefteyekê li qampê perwerde meşand, perwerde û nîqaşên serokatî li ser kesayeta şoreşgerî bû ku çawa gava xwe bavêje, xwe ava bike û çawa xwe li pêş bixe. Ez mabûm gotinên û tevgerên serokatî bişopînim, ev cara yekemîne ku ez perwerdeya serokatî bi vî rengî dibînim. Rast e min heft heyvan li mala serokatî perwerde dît, lê ne bi vî rengî bû. Piştî hefteyekê serokatî çû qampa Turkî. Bernameya qampê piştî çûna serokatî jî wisa bû, hevalan perwerdeya serok dixwedin û me li ser nîqaş dikir, perwerde her roj berdewam dikir. Carna Piştî nîvro perwerde tune bû, me ji xwe re pirtûkên serokatî, dîrokî, siyasî û roman dixwendin. Em hevalên keç her sibeh piştî civînê me sipor dikir, rojê gurûpek hewş û cihê kevokên serokatî dişûştin. Rojane du heval xwerinpêj bûn xwarina hevalan tevan Çêdikirin, me tevan xwarin bi hev re dixwar. Danê sibeh, nîvro û êvarî jî nobeçiyên me li ser xanî nobet digirtin. Jiyana me di qampê de bi vî rengî derbas dibû. Her hefte serokatî dihat qampê û tevlî perwerda me dibû. Ez neh heyvan li qampê mam, ji bo Kesayeta min pir

gerek bû. Dema ez di qampê de bû, min hinek pirsgirêk jiyan kirin û bi perwerdê re kesayeta min hate guhertin, berê min qet ferq nedikir, lê niha ez di wê ferqê de me. Di perwerdê de heval ji gelek herêman, ji çiyê û ji nav xebatan hebûn, taybetmendiyên her kesî derdiket pêş, nakokî û nîqaş pir hebûn. Serokatî timî mûdaxele dikir û digot hinek heval nizanin ev nakokî çi ne û jiyan dikin, dilpak in bila ji xwe re tecrûba bigirin, ji bo dema biçin çiyê mefahîman nas bikin. Ev gotinên serokatî ji bo min derman bûn, ji ber di perwerdê de hevalan li ser xebatên xwe, tecrûbeyên xwe û li ser kesayetên xwe nîqaşên berfireh dikirin, hin kesayet hebûn mefhûmên wan pir xerab bûn, bandora xwe li rêxistinê dikirin.Ev ji bo min pêşketineke mezin bû. Nabêjim ez pir li pêş bûm, kêmasiyên min pir hebûn, ji ber mirov di nav jiyanê de şaştiyên dike, ji xwe ew ku şaştiyan nake dêmek tucarî jî li pêş nakeve. Dema tu bixwaze gavekê bavêje kê

masiyên te jî wê pê re derkeve. Dema hevalan yek bi yek Kesayetên xwe vedikirin, pir hevalan xwe di kesayetên wan de didîtin, ji ber ku eynî kêmasî jiyan dikirin. Perwer de ji mirovan re wekî nan û xwê ye, pêwîstiya her kesî bi perwerdê heye. Di encam de perwerda me bi nakokî û nîqaşan hate derbaskirin û bi tevlîbûna serokatî jî perwerda me re sererast dibû.

## Ez Û Heval Nafiya Xwarinpêj Bûn

Ez û heval Nafiya xwarinpêj bûn, sibê zû em rabûn, me taştê ji hevalan re çêkir, xwarina xwe xwarin û perwerde dest pê kir, paşê serokatî jî xwar û xwe amade kir û tevlî perwerdê bû. Wê rojê hevalên nû ji çiyê hatibûn. Me xwarina wan jî çekiribû, perwerde qediya, me xwarin ji hevalan re danî. Serok û hevalan bi hev re xwarin, ji fediyan hevalan têr nexwarin û xwe vekişandin. Me xwarina xwe kişand xwaringehê, serokatî hat û got hevalên ji çiyê hatine fedî kirin û xwarin nexwarin, ji hevalan re xwarinê bibin bila bixun û çû bi hevalan re nîqaş kir û got hûn ji çiyê hatine, divê hûn jiyana me li vir baş nas bikin û tecrubeyên xwe yên çiyê jî bi hevalan re parve bikin. Êvarî dîsa me xwarina sivik da serokatî ji bo pê aciz nebe. Di 15`ê Tebaxê de careke din ez û hevalekê xwarinbêj bû. Milet ji Cizîrê Şamê, Helebê û mêvanên ji derve jî hebûn hinek ji wan ne kurd bûn. Dema bi serok re nîqaş dikirin me tiştek ji wan fam nedikir. Hevalan amadekariya şahiyê dikirin û milet tev amade bûn. Di destpêkê de serokatî axaftina 15`ê Tebaxê kir û li ser wateya vê rojê û ev çalakî di dîroka Pkk`ê de tê çi wateyê. Miletê me bi tilîlî û çepikan, hevalan jî bi stran û sikêtiçan dest bi şahiya xwe kirin. Hunermend Merziya jî amade bûbû, bi stranên wê serok û milet pir kêfxweş bû û wisa bi stranên Merziya şahiya me bi dawî bû.

Ne hemû demên me bi perwerde û nîqaşan derbas dibû, di bêhin vedanê de sipor û lîsk jî hebûn. Her cara ku serokatî bihat qampê me bi gogê dilîst. Min pir ji futbolê hez dikir, lewma min

timî bi serokatî re bi futbolê dilîst û serokatî pir ji lîska min hez dikir ji ber ku min zanîbû bilîsta.

## Ez Nobetçî Bûm

Serokatî li qampê bû û mêvan jî hebûn. Hinek heval wê biçûna nav xebatê û hevalên pir xwe amade kiribûn ku biçin çiyê. Serokatî bi hevalên ku wê biçûna nav xebatê re nîqaş dikir, ji ber ew heval wê biçûna eyaleta Cizîrê. Ez jî nobetçî bûm, cara yekê bû ku ez çekê ya kilaşînkofê radikim. Dawî serokatî ji min re got heval tu dikare here çiyê. Ez ji kêfa re firiyam. Demekê di qampê de ez govenlikê serok bûm, hevla keç ya ku li ser govenlika serok di sekinî ez fêrî çekê kirim, paşê hevalan di qampê de perwerde li ser çekê dan me. Min xweş ji kilîşankofê fêm kir, ji ber wê jî ez govenlika serok bûm.

## Encama Perwerda Me

Perwerdeya me dibin denetimê serokatî de derbas bû . li gorî min tecrîbeyeke pir mezin bû, encamên baş min jê girt, şenseke pir baş bû ku min bi serokatî re jiyan kir û di perwerdeya wê re derbas bûm, ji ber pir heval bi hsret bûn ku serokatî bibînin, lê şehîd ketin û serokatî nedîtin. Ez di qampê de weke berpirsiyarekê di dûzeya taximekê de tev digeriyam. Ew ruhê min ji serokatî girt heya niha jî ez li ser wî asasî dimeşim, ji nuha û şûn ve jî dîsa ez ê li ser asasê wî ruhî bimeşim. Min soza xwe dabû serokatî û şhîdan ku ez bi vî rengî tev bigerim.

## Gurûpên Çûn Çiyê

Dema serokatî ji qampa turkî hat qampa kurdî, hevalan di roja 4`ê Nîsana 1998`an de xwe amade kiribûn ku biçin çiyê. Serokatî çû perwerdê bide hevalan û yek bi yek sozê wan girtin. Di dawî de hevalan tevan xwarina dawiyê bi serokatî re xwarin, me toreneke mezin ji wan re çêkir û xatir ji serokatî û ji me jî xwestin û çûn. Heval ji qampê derket, serokatî li dû wan çû heya derve û em jî tev li dû wan giriyan, serokatî ji me re got îro dora wan e sibê dora we ye.

# Gurûpa Me Çû Çiyê



Di 5`ê Nîsana 1998`an de em xwe amade dikir ku em biçin çiyê. Serokatî derbasî perwerda me bû, di dawî de got bila heval bên soz xwe bidin. Yek bi yek sozên hevalan teva girt û min jî soza xwe da. Li beranber serokatî sozdayîn zor bû, ta ku hevalekî xort di sozdayînê de ji qidûm ket û hin heval diricifîn. Paşê serokatî bi hevalan re wêne kişandin, gurûp gurûp bi serokatî re li hewşê wêne kişandin. Em bi hev re qederekî li hewşê meşiyan, di dawî de me cara dawî xwarin bi serokatî re xwar, serokatî got heval bixun ji bo ku hûn di rê de birçî nebin. Dawî tirimpêla me hat serokatî got heval xatir bixwazin û bi rê kevin bila dereng nebe. Tevayî hevalan yek bi yek çûn rûwê serokatî û xatir xwestin. Tev ketin tirimpêlê , dema min jî xatir xwest û ez ketim tirimpêlê serokatî destê min girt û berneda heta tirimpêl derket derve. Serokatî li dû me derket û destê xwe ji me re hild û got serkeftin be hevalion

## Gurûpa Me Bi Rê Ket

Me xatir ji serokatî xwest û em bi rê ketin. Em tev giriyan ku çawa em û serokatî ji hev qut bûn. Em çûn Qamişlo, em sê rojan li Qamişlo man, ji Qamişlo em çûn gundên derdora Dêrkê, li wê derê gurûpên hevalan tev gihiştin cem hev. Me çek xwe girtin û em amade bûn ji bo em derbasî çiyê bibin. Em şêst û sê heval bûn, di nav me de tenê hevalên ku li çiyê û di nav şer de mabûn heft bûn, em hevalên din jî tev ji nav xebatê hatibûn.

## Ez Li Çiyê Bûm

Em tev ê ji Sûrî û Ewrupa bûn, em hefteyekê li Dêrikê man, paşê em bi rê ketin. Bi destpêka şevê re kemyonek hat, em tev ketinê û bi rê ketin heya cihekî pê çûn, paşê em bi meşê çûn, wê şevê em li wir razan heta bû sibe. Me taşta xwe xwar,me roja xwe bi nîqaşê derbas kir. Ber êvarê em bi rê ketin. Em çûn ber ava mezin, dunya buhar bû ji ber baran pir hatibû pêlên avê pir radibûn. Hevalên qoriya gelekî xwe amade kirin û hev derbas kirin, heval gurûp gurûp derbas bûn. Dora gurûpa me jî hat rastî min nizanî hisêr min çawa hat, hesteke cuda bi min re çêdibû, di cih de şehadeta heval Mihyedîn, Ahmed û Zinar hatin bîra min. Gurûpa me jî av derbas kir. Li dû me du gurûp mabûn, hevalan ew jî derbas kirin, ji ber em pir bûn yazdeh heval li milê din man. Qoriya ji berpirsiyarê me re gotin em îro nikarin wan hevalan jî derbas kin, divê em ji vî milî avê seat heşt bi rê kevin. Heger em seat heşt bi rê nekevin wê gurûp tev li tehlûkê bikeve, divê berî destê sibê em bighên Çiyayê Spî, sibê em ê vegerin gurûpa wî milî binin. Em ji rojavayê Kurdistanê derbasî milê başûrê Kurdistanê bûn.

## Di Jiyna Min De Ew Xwesteka Min Bû

Ji sala 1988`an de ez qerarlî bûm, min dixwest ez derbasî çiyê bibim, ev xwestek bi min re bûbû hesret, lê partiyê ev xwesteka minî şoreşgerî pêk anî. Di jiyana min de xwesteka min pêk hat ji ber wê jî dilê min wekî dilê çûkekî lêdida. Min bawer nedikir ku ez derbasî wî milê ava mezin bibim, lê ez derbasî bûm. Wekî ez derbasî cîhaneke din bibim. ji ber di jiyan mirovên şoreşger de derbaskirina wî milê azadîbûn e. Min digot ez nû azad bûme. Ez ji xwe re di wî xeyalî de bûm heta hevalan bang kirin û gotin, hevalino amade bin em ê bikevin tevgerê. Bi ruhekî pir mezin em amade bûn û em ji ber avê bi rê ketin. Ji bo me ev cara yekê bû ku em meşa gêrîla dikin, her hevalek bikêf û eşq dimeşiya û meşa me pir dirêj kir û gelek cihên tehlûkê me derbas kirin. Di wî cihê tehlûkê de em tek tek dimeşiyan, ev cara yekê bû ku em bi şev meşeke wiha dirêj dimeşiyan. Em gihaştin nîvê rê nêzî ziftê bûn, çend turimpêl derbas bûn ji ber wê me tevan xwe li erdê dirêj kir, heta tev derbas bûn em ketin tevgerê û meşiyan. Meşa me ji seat heşt êvarê heta pênçê sibehê heta em gihaştin binê çiyayê spî, li wê derê heval li hêviya me bûn û em bi lez çû berî roj derkeve û gundî me bibînin, ji ber em ê têketana tehlûkê de. Hevalan ji hev re digotin em ê bi vî çiyayî ve hilkişin, rêya seat û nîvekê ye. Em meşiyan û meşiyan em zû negihaştin jorê, di rêya deştê de em xweş dimeşiyan, lê bi çiya ve me zehmetî pir kişand ji ber heval êdî westiya bûn. Bi destê sibehê re xewa hevalan dihat û di rê de pir rûdiniştin, hevalan ew bi zorê radikirin ji bo em bigihêjin cihê saxlem. Em meşiyan heta em gihaştin Boxazê, me Boxaz qut kir em gihaştin cihê saxlem. Hîn pir heval li dawî

mabûn, desptêkê ez û du hevalên keç gihaştin Boxazê. Hevalan ji me re gotin hevalên din li cem tahtêne herin cem wan xwarinê ji xwe re çêkin. Em gurûpek heval çûn cem wan, ji me re taştê anîn,taşta wan penêr û çayê bû. Hevalan ji me re gotin xwarina xwe bixun û herin xwe rihetkin heta heval tev werin. Em pir westiya bûn ji ber wê em çûn bin tavikê razan, nema bi tiştekî hesiyan heta hevalan bang me kirin û gotin rabin xwarina nîvro bixwin. Em rabûn seat du bû, me xwarin xwar hîn hinek hevalan xwarin dixwarin, berpirsiyarê me got ka heval Şîlan di nav we de nexuya ye, em tev rabûn û geriyan, em çûn şopa xwe me wê nedtin, heval çûn nav dar û gund jî lê ew nedîtin, heta seat dehê şevê em li wir man û heval digeriyan lê nedîtin. Paşê hevalan gotin bera heval tev biçin tabûrê, em ê gurûpekê derxin bila lê bigerin heta wê bibînin. Berpirsiyarê me civîn ji me re çêkirin û got heval rast e hûn li çiyê nû ne, lê di nav partiyê de hûn ne nû ne, divê hûn fam bikin ku we ewqasî perwerda serokatî dîtiye, Bila moralê we nekeve . Em wê şevê bi moralekî ketî meşiyan, me hevala xwe Şîlan winda kir û li şûna xwe hişt, em tev difikirîn eceba wê heval Şîlan bibînin, em di vê yekê de difikirîn heta bi sibê re em gihaştin cem tabûrê. Em du rojan li tabûra çiyayê spî man, heta wê demê hîn heval Şîlan nedîtibûn. Seat şeşê êvarî em bi rê ketin, dema em dimeşiyan çipê baranê dihatin, heta em gihiştin Metîna. Em tev şil bûbûn, em rûniştin bêhina xwe vedin û hevalan jî agir dadan xwe zuha bikin. Bi seat çarê sibê re em bi rê ketin, hevalan rê winda kirin û heta bû sibeh em li dora xwe dizîvirin, em heta nîvro meşiyan û em bi ser bêlûkekê vebûn. Min li wir hin heval nas kirin, Şehîd Rehşan jî li wê bêlûkê bû. Hevalan bêlûk nas dikirin, em li cem wan man heta êvarî paşê

dîsa em bi rê ketin. Em hinekî meşiyan dîsa em gihan cem hin hevalan, piştir rêya me dirêj bû em rojeke sax meşiyan. Heval hatibûn pêşiya me, xwarin ji me re anîbûn. Em li wir sekinîn me xwarin xwar, Hevalan gotin em herin, lê em nema karîbûn bimeşiyana. Ji me re gotin nêzîk maye, lê em heta êvarî meşiyan. Em êvarî gihan cem bêlûkê, durojan em li wir man, paşê em çûn qerargehê. Di encam de em li Metîna tev geriyan. Em li qerargehê bi cih bûn. Perwerda leşkerî dan me, me deh rojan perwerde dît. Perwerda me li ser biksî, bîsving, qenas, qilêş û bûmban bû, tevger û bazdan û êrîşa ser qerqolan bû. Mangê me çêkirin naylon bûn, dema baran hat av di bin mangê re derket. Şev û roj em rûniştîbûn, me ji xwe re agir dadida, deh rojan em gerim nebûn. Ferza me çêbû, hinek ji me çûn Botan, Heftanîn, Garê, Zapê, Xwawirkê şehîdan û Zaxrosê.

## Ez Çûm Zaxrosê

Em çûm Zaxrosê du rojan meşiyan, li Kurê Jaro rojekê em man û rojekê em li ber ava şîn jî man, ev di rêya me de bûn em li cem hevalan disekinîn. Em du rojan meşiyan heta em gihaştin Zaxrosê. Em çûn gundê Satê heval li jorî gundê Satê bûn. Em çûn cem hevalan ji Çiyayê Spî heta Metîna heta Ava Şîn. Dar, gul, nefel û çîçek hemû tev şîn bûbûn û kaniyên avê diherikîn, dengê avê pir xweş bû û di nav gîhan de mirov winda dibû. Dema dibû sibe û tavik derdiket me li derdora xwe dinerî bêhna kulîlkan û dengê çûkan bilind bû te digot qeyî buhişt e, dema mirov erdinîgarî û daristanên wê dinêrî, digot qey tu ji cîhanekê derbasî cîhaneke din bûye. Em çûn gundê Satê, bêlûkek heval li wir li jorî gundê bû, li nav tahtan sekinî bûn, hemû hevalên xort bûn, em jî mangak hevalên keç bûn. Destpêka piratîkê bû, bêlûk li heviya taximê hevalên keç bû. Em çend rojan li cem wan man, hevalên xort diçûn guravê ji gundê satê û ber bi jor ve diçûn Zaxrosê, heval di nav berfe de du-sê rojan diçûn erzaq tanîn. Min ji xwe re li jiyana hevalan temaşe dikir, ji bo ku ez fêrî jiyana gêrîla bibim. Dunya sar bû, timî mij, berf û baran bû. Li Zaxrosê zivistan bû, lê li Çiyayê Spî, Metîna, Garê, Zap û Ava şîn buhar bû. Deme derbas bû hevalan ji me re gotin xwe amade bikin em ê biçin çarçêla

## Dola Deriyê Hirçê

Duniya mij bû û bayekî pir sar dihat. Em dimeşiyan çiya pir bilind bû, oksicîn kêm bû û nefesa me pir teng dibû. Rêya me pir dirêj bû. ew dol tev berf bû tu rêyên din tune bûn. Em li ser berfê dimeşiyan, zûqaqên Deriyê Hirçê pir bûn, nigên me heta nêvî di nav berfê de diçû, carnan jî em di nav de diçikiyan û pir heval jî nikarîbûn zû xwe xelas bikin. Hevalan alîkariya hev dikirin ji bo xwe zû bigihînin derî, me zûqaq xelas kirin û em gihiştin ser kaniyê. Me navberk dayê, ji bo heval tev bigihên hev, lê ciyê rûniştinê ji berfê tune bû. Heval tev gihiştin hev bêhna xwe vedan, paşê em meşiyan. Du roj bûbû me xwarin nexwaribû, ji ber vê jî me zehmetî dikişand. Di nav wan de em çar şervanê nû bûn. Hefteyekî me li Zaxrosê çêbibû, em nêzî Deriyê Hirçê bûn, çend gav mabûn em bigihên tehta Deriyê Hirçê. Hevaleke pir hûr û zehîf li pêşiya min dimeşiya, ji tewazina xwe ket û li ser berfê şemitî, xwe bi min girt û ez jî bi xwe re şemitandim, em tev çek û çentê xwe şemitîn. Dema em her du şemitîn, me hev du bernedan, yan em ê bi hev re şehîd bikevin yan jî em ê bi hev re xelas bibin. Li pêşiya me tehteke mezin hebû, em şemitîn çûn li bin guhê tehtê ketin û nigê min di tehtê de eliqî û ez lê zîvirîm. Hingî em bi erdê ve herikîn û li kevir û tahtan qelibîn, canên me tev birîn û şîn bû û em tirsiya ku derek me şikestibe. Heval nikarîbûn xwe bigihînin me û me xelas kin, tevan gotin wê li tehtê kevin û şehîd bikevin yan jî wê biherikin û li binê dolê bisekinin. Em rabûn me xwe ji berfê daweşand me li jora xwe nerî ku heval tev li me dinêrin. Dema em rabûn û me xwe girêda kêfa hevalan hat, lê em ê çawa bigihên cem hevalan. Me bi destê

hev du girt û em meşiyan, bi zehmetiyeke mezin me xwe gihan hevalan. Di wê berfê de em nikarin bisekinin, heke em rûnên û bisekinin em ê şehîd bikevin. Dema em gihiştin cem hevalan, heval tev bi tahta Deriyê Hirçê ve hildikişiyan, bi zehmetî bi ser derî vebûn. Bakî pir sar dihat, mirov li hev dizîvirand. Ba, bahoz û mij pir xurt bû me nikarîbû çavên xwe vekira. Heval tev gihiştin derî û xwe rihet kirin, paşê me xwe berda Çarçêla ya binav û deng. Berî em bigihên Deriyê Hirçê meşa me tev hilkişandin bû, me Deriyê Hirçê derbas kir meşa me tev bû daketin. Bi ber banga sibe re em bi rê ketin, me ji ser derî xwe berda xwarê û me xwe şemitand heta em li xwarê sekinîn. Paşê em rabûn meşiyan, em çûn ser gola Çarçêla. Me ji xwe re lê temaşe kir, hingê xweşk û xweş bû mirov naxwaze dev jê berde û here. Ber êvarê em gihiştin cem hevalan. Çarçêla bi berf û deqema xwe bi nav û deng e. Hevalan mangên xwe li ser tehtan çêkiribûn, em ji serma bûbûn bûz, agir ji tune bû em xwe germ bikin ji ber ku heta qirşikên daran tune bû û wê şevê em li ser tehtan razan. Wê şevê xew neket çavên me heta bû sibeh me xwe da ber tavê. Çarçêla bay, bahoz, berf mij, duman, sar û seqem lê pir e û oksicîna wê kêm e. Tevî vê zahmetiya wê xweşbûna wê mirov jê têr nabe. Havîn, payîz, ziviztan û buhar bi hev re lê tê jiyankirin. Çarçêla bi ava, gol û bi şînkahiy xwe tê hezkirin. Her Çiqasî ba û bahoz hebîjî dîsa xweşe. Her çiyayên wê hişk in û oksicîn jî ji ser mirov qut dike dîsa jî xweş e. Bi xweşbûna xwe xwe dixe dilê mirov.

## Ez Çûm Herkê

Li Herkê temşîtên leşkerî derketin, nû wê rojê mangak hevalên keç hatibûn cem me, ji bo em bibin taximek hevalên keç û bêlûka me temam bibe, ew heval rojekê li cem me man, roja din me xwe paş vekişand. Manga me ji qomîtan, sê hevalên keç û pênc hevalên xort pêk dihat. Dunya êvar bû berf li erdê spî dikir heval ketin sira xwe û meşiyan. Qaşo em çar hevalên keç bi hev re bûn, min nedît çawa meşiyan bêlûk tev çû û ez bi tena xwe mam. Du heyvên min çêbibû hevalan ez hiştim û çûn, ez wekî hevalên kevn nikarîbûm bimeşiyama, di berfê de min zehmetî dikişan û ez fizikî pir zorleme dibûm. Bi şev bû û ez berfê de pir diketim, hevalên xort xwe xelas kirin, tev ji min derbas bûn û ez bi tena xwe mam. Min şopa hevalan li ser berfê berneda, ez wê şevê bi tenê û bakî pir cemidî dihat, dunya li pêşiya min tev berf bû û kesek li dora min tune ye ez, berf, ba, bahoz û ezman bi hev re ne. Hemû hevalan nizanîbû ku ez li dawî bi tenê mame, lê yên li dawiya gurûpê zanîbûn ku ez bi tenê mame, Dawî ew jî çûn. Min nizanîbû ku ez çi bikim, ez vegerim nabe, ez bisekinim dîsa nabe, şopa nigê hevalan li ser berfê xuya ye, min şopa nigan girt û ez meşiyam. Ez çar seatan bi tena xwe mam, min ji xwe re got niha dijmin yan dirindeyek ji min re derkeve, divê ez zanbim ber xwe bidim û xwe biparêzim. Min qilêşa xwe xiste destê xwe û min fîşeka wê kişand ber û ez meşiyam heta ez nêzî tehtan bûm. Destpêkê min got qeyî heval in wekî mirovan bûn, ez nêzîk bûm min dît tev teht in. Ez li wir sekinîm û li ser tehtekê rûniştim û ponijîm. Dengê lawiran yên guran, hirç û çeqelan dihat. Duniya tev berf e lawir tev birçîn e.

Ew jî li nêçîrekê digeriyan. Ji nişkave dengek ji dûr ve hat, min xwe ji ser rê da alî, heta ez wan nas bikim. Hêdî hedî nêzî min bûn û bi hev re daxivîn ban hev kirin gotin heval, min bawer nekirû min got qeyî xewn e, ez ji kêfa re firiyam. hevalên taxima locistîkê bûn. Dema min dîtin ji min pirsîn, çima tu bi tenê mayî, tu şervaneke nû ye çawa te bi tenê hiştine, ma qey tu ne tirsiya? Min got nepirsin min we dîtin ji bo min ev bes e. Heval Jiyan Siroc bi wan re bû, qomîtana manga hevalên keç bû. Ez bi hevalan keç re çûn, heval Jiyan pir alîkariya min kir. Ez pir li ser berfê dişemitîm, hevala Jiyan bi destê min digirt û min ji cihê zehmet derbas dikir. Min di dilê xwe de got, çima hevalên kec yên destpêkê bi min re bûn, weke heval Jiyan alîkariya min nekirin. Heval Jiyan ji min re digot heval Dîrok nigê xwe rast navêj hinekî xwar bavêje, ji bo tu neşemitî û rêbazê meşa berfê fêr bibe. Dema tu bi xwaze tu tiştekî fêr bibe ji min pirs bike, bila moralê te bilind be. Taximê locistikê hêstir jî bi wan re bû, erzaq ji bo bêlûkê bi wan re bû ez bi wan hevalan re meşiyam heta em gihan deriyê hêstiran. Derî bilin bû tev teht bûn, bêhna mirov disekinî, hêstir jî carnan nedimeşiyan. Ez tu carî alîkariya heval Jiyan û wan hevalan ji bîr nakim. Ez nizanim ku ew heval qedera min bûn. Me xwe ser jêr berda rêyeke xweş û berf tune bû. Rê tev ziqaq bû û bi destê sibê re em gihaştin cem bêlûkê. Heval ji xew rabûn û gotin em ê xwe berdin xwarê û herin gund, me xwe amade kir û hêdî hêdî em meşiyan. Em gihiştin gundê Bêdewê. Me bêhina xwe vekir û me xwarin xwar û çayê vexwar. Piştî du rojan gurûpek tepeciyan hatin du heval ji wan kêm bûn, heval Rûken Kobanê û heval Hogir her du şehîd ketibûn. Nû rojek heval Rûken li bêlûkê çêbûbû, ez û hevalan pir bandor

bûm. Hevalan çûn cenazê wan anîn, me tirbên her duwan li cem hev çêkirin û me ew veşartin.

Dema li Herkê bûm temşîteke leşgerî derketin û me xwe paş vekişand. Bi şevê em meşiyan çûn ser gola Herkê. Destê sibehê hevalan gotin bera heval xwarina xwe çêkin û buxwin, me xwarina xwe xwar û me çaya xwe jî vexwar. Paşê em rojekê sax meşiyan, rê nexweş bû dunya sar û seqem bû, em çûn heta Deriyê Kera. Hevalan xwe bi şirîtê berdan, paşê xwe li ser berfê şemitandin. Her kes nikarîbû xwe bi şerîtê berde, hinek heval xwe bi tehtan ve berdan xwarê. Me xwe berda jêr û em çûn gundê Bêdewê, em hefteyekê bê xwarin man, heval tev bê hêz bûbûn. Ji nişka ve dengê teqîna çekê hat, qomîtan me du beraz kuştin û anîn ji hevalan re, me sê rojan xwar. Di dawî de em dîsa çûn Herkê.

## Ez Li Çarçêla Bûm

Em li çarçela bûn, demeke kin ez li qerargehê mam, paşê ferza min çêbû û ez çûm bêlûkê. Rojeke min li bêlûkê çêbûbû, opirasiyenên leşkerî derketin. Wê şevê dora hevalên keç yên tepe bûn, di taximê me de pênc heval derketin ji bo biçin tepe, ez jî di nav wan de bûm, me xwe amade kir ji bo em biçin tepe. Seat duwê şevê em bi rê ketin û em çûn tepe, em gihan tepe û me cihê xwe girt. Du heval ji bo keşfê çûn jorê, em her sê hevalên din jî me mewziyên xwe girtin. Hêdî hêdî dunya ronî bû, me leşker di binya xwe re dîtin, nû ji xew radibûn ,cihê nobeta me girtibûn, ew bêlûkeke sax bûn, çawa ji xew rabûn belabûn, hin ji wan çûn tepê Zincîr û tepê din jî girtin. Dora me tev girtibûn, me xeber da bêlûkê ji bo xwe bidin cihê saxlem, jibo em li dijmin bidin û parastina hevalan bikin heta xwe bidin saxlemiyê. Di wê demê de serokatî ferman dabû ji bo sekinandina şer û kişandina hêzên partiyê ji eyaletên hundir, lê em li heviya hevalên bêlûkê bûn ji bo ku ji me re bêjin li dijmin bidin. Çar qilêş û bîksîk bi me re hebûn, agahî ji me re hat ku em li dijmin bidin. Her du hevalan di mewziyekê de li wan da, me dorpêç kirin û xistin çembereke pir teng de. Me nizanîbû wê heval herin tepê himber me, hîn negihiştibûn tepe qoriçiya tepe girtibû, heval çû tepê himber wan. Qomîtana me ji min û hevaleke din re got, hûn her du herin wî tepê di bin me re bigrin û parstina me bikin heta em werin cem we. Me li dijmin da heta neh û nivê sibê, fîşekên me kêm man.Heval bi lasilkî diaxvîn pirsa me dikin. Me ji hevalan re got Fîşekên me kêm mane, parastina me bikin heta em xwe bigihînin cihekî saxlem, hevalan jî gotin dora we tev dorpêç

kirine, tepe berdin û xwe bidin cihê saxlem. Di wê ortê de cîhazê me xerabû û me xwe berda xwarê ji bo em xwe bighînin tehtê. Em tek tek di nav teht û keviran de meşiyan, bi zehmetiyeke mezin me xwe ji wî tepî xelas kir. Em li tepê zivirîn û gihiştin ser berfê û meşiyan. Berfeke hişk û şimantok weke mîxan sekinî ye, em li ser dişemitîn xwarê. Ew tepê em lê bûn dijmin girt, dixwestin me bi saxî bigirin ji ber wê bi rengekî dizî ji sê aliyan hatin tepe, lê vala derketin, nizanîbûn me xwe ji tepe kişandiye. Hemû hevalan digotin ya em şehîd ketine û yan jî em ketine destên dijmin. Dema dijimin tepe girtin tev keşifkirin û dîtin em ne li wirin. Wê deme me ji xwe re di nav tahtan de li wan dinêrî. Ji bo em xwe xelas bikin me xwe li tepê berfê girt, başqe çara me tune bû yan em ê xelas bibin yan şehîd bibin. Kîjan cihê me karîbû tê re bimeşiyana tev wekî şûran sekiniye. Me xwe ji wê tehtê xelas kir, em li tepe zivirîn û bi berfê ve hilkişiyan, her em dimeşiyan em dişemitîn. Derdora me tev miji û dûman, me bi zehmetî xwe gihand nêvî û me nema karîbûn bi berfê ve hilkişiyana, her em hildikişiyan em dişemitîn. Hevalan gotin ka em ê du hevalên xwe li pêş xwe bişînin, belkî em karibin hilkşin û rê vekin. Her du heval çend gavan meşiyan li ser wê berfê şemitîn, li pêşiya me çalek hebû, heval di wê çalê de werbûn. Baş bû ku di çalê de werbûn û xelas bûn, heger ne ji wê çalê ba wê li bin guhê kevir û tehtan û li wan sîxên berfê ketibana û şehîd ketibana. Di dawî de me nîqaş kir ku em nikarin hilkişin û ne jî dakevin xwarê ji li pêşiya me berfeke dijwar heye em û li paşiya me jî dijmin her der girtiye. Me nîqaş kir ku em xwe di nav berf û tehtan de veşêrin, me nikarîbûn xwe bilivanda, cihê rûniştinê tune bû, nigên me li ser berfê û pişta me li tehtê

bû. Orta berf û tahtan çar mitran kur bû. Ji seat yazde heta heftê êvarê em di nav berf û tahtan de man. Dengên balefir û topên dijmin ji me qut nedibû. Hilîkopter di ser me re diçû û dihat, lê nedizanî em di ku de ne. Heta êvarî geriyan cihê me nas nekirin, em jî li cîhazê xwe xebitîn û çêkir. Em bi qomîtanê xwe re daxivî ji me re got, ma hûn hîn saxin hûn li ku ne, dijmin herder girtiye, me got me xwe daye cihê spî û me xwe li wir bi cih kiriye. Bersiv da û got, ji cihê xwe nelivin heta ez xeberê bidim we. Me di nav wê berfê de bi dorbînê dijmin keşif dikir, me gurupek ji dijmin didît li tepê himber me danîbûn. Em ji sibehê heta êvarî man di nav wê berfê de, seat heftê êvarî qomîtanê me xeber da ji bo em xwe berdin jêr, dijmin çû xwe paş vekişandin, cihê hûn tê re hetine dîsa di wir re vegerin. Me xwe berda jêr dîsa em di ser wê berfê re daketin,ew rêya em tê re çûn nêzî cihê dijmin bû. Em di ber gola Çarçêla re derbas bûn û em gihan bêlûkê, heval tev li hêviya me bûn, ji ber bawer nedikirin ku em ji destên dijmin xelas bûne û tev kêfxweş bûn. Rastî ez heta niha jî tînim bîra xwe me çawa xwe xelas kir, çiya û berf em parastin. Rojekê em gurûpek heval çûn guravê, em du hevalên keç û sê hevalên xort bûn. Em êvarî bi rê ketin heta sibê em meşiyan, wê rojê em çûn gundekî ew gund vala bû, kesek tê de tune bû em rojekê li wir man, êvarî em bi rê ketin. Em çûn gundekî din ji bo erzaq heft hêstir bi me re bûn, yek ji wan hestira dîn bû, hevalan nû kirîbûn. Ew hestirê dîn ji rê derket û reviya, ez û hevalekî xort bi du ketin ji bo em bigirin min benê qirka wî girt. Hêstirê ez li pê xwe kişandim, dawiyê pêhnek li min da, pêhîna wê li ser aliyê dilê min ket. Ez pir êşiyam, lê min ew berneda heta heval hatin ew girtin, min nema karîbû bimeşiyama. Em  nêzîkî gund

bibûn, ji lêdana hêstirê bêhna min teng bûbû. Sîng û nigên min dêşiya û gerek em biçin gund erzaqê xwe bînin. Lê ez nikarîbûm bimeşiyama. Heger ez bi hevalan re herim wê dereng bighên gund û heta ji gund derkevin wê li me bibe sibeh, ji ber wê heval bi min pir mijûl bibin. Min ji hevalan re got hûn herin erzaq ji gund bînin, ez ê li vir bimînim. Ji ber erzaqê bêlûkekê û heval ji bo min li tehlûkê bikevin nebaş e. Hevalan ji min re gotin em ê çawa te tenê li vir bihêlin. Min israr kir û wan qanih kirin ji bo herin û min ji wan re got ez ê li ser rêya we bisekinim heya hûn werin. Hevalan nexwestin min tenê li wir bihêlin ji ber dunya şevû tarî bû, lê bi israra min heval çûn gund. Ez wê şevê bi tena xwe li wî cihî mam, şev tarîbû û dengên guran, çeqelan û hirçan dihat. Çeka min di destê min de bû û ez hişyar bûm, heta hevalan barê xwe bar kirin û hatin dereng man. Dema hatin ez li pêşiya wan bû, em gihiştin hev û em bi rê ketin. Min zehmetî di meşê de dikişand, heta me cihê tehlûkê derbas kir û em gihiştin cihê saxlem. Me li wir navberek dayê û xwarîna xwe xwar, dîsa em bi rê ketin. Şev û rojekê em meşiyan heta em gihişti bêlûkê bi saxlemî.

## Di 1999`an Ez Çûm Cîlo

Me qampa xwe ya zivistanê çêkir, hemû heval dixebitîn û kevir kom dikirin. Me qampa xwe bi kevir û axê lê dikir, em pir di westiyan ji ber ku di deh rojan de me xelas kir. Em derbasî zivistanê bûn û perwerda me ya zivistanê dest pê kir, me heyvekê di perwerdê de derbas kir. Dunya tev berf bû erd ji berfê spî dikir û heval di nav berfê de bi hev şadibûn, me bi berfê li hev dida. Di berfê de me karên xwe dimeşan û pêk anîn û em diçû daran jî.

Roja 16`ê Sibatê bû, em gurûpek hevalên keç me nan çê dikir, ji nişkave qêrîn bi hevalan ket, em tev li hev kom bûn, me nizanîbû çi çêbûye. Hevalan got, serokatî hatiye girtin, me bawer nekir û bû qîreqîra me û em giriyan. Her hevalek bi cihekê çû wê demê em li ber Avaşîn bûn, heval tirsiyan ku heval tiştekî bi xwe bikin. Tabûr tev kom bû û civîn hat lidarxistin û ji tevayî hevalan re hat gotin, divê kes bê agahiya partiyê tiştekî nekin. Me li nûçeyan guhdar kir ku me nû bawer kir serokatî hatiye girtin. Min tucarî bawer nedikir rojekê ji rojan serokatî tiştek pê were, wekî dîna li min hatibû û derûniya min pir xera bûbû. Dema min heval didîtin ew jî weke min bûn û ji min xerabtir jî bûbûn. Min ji xwe re digot ez ê xwe bavêjim Avaşîn, min raporek ji partiyê re nivisî û min tê de got, ez amade me ji bo serokatî her tiştî û eylema intîhariyê bikim. Çend roj derbas bûn hevalên eyaletêhatin ji me re civîn çêkirin. Li ser rastî , qompilo, mefhûm û felsefeya serokatî tê çi wateyê û çawa dunya tev li himberî kesê serokatî di nav tevgerê de ne, ji ber ku ne li gorî berjewendiyê wan e. Felsefa serok apo cîhaneke nû dafirîne.

## Piştî Sê Rojan Me Qampa Xwe Berda

Şeva siyan piştî girtina serokatî me qampa xwe berda, di nîvê şevê de tabûr tev ket tevgerê. Dunya tev mij û baran bû, em li ser berfê di şemitîn û barên me giran bû ji ber me tiştên zivistanê tev bi xwe re birin. Şeva ku em ji qampa xwe derketin, dijmin ket wir. Em çûn orta Cîlo û Geliyê Zapê, nîvro em gihan cihekî lê sekinîn û me ji xwe re agir dada, me xwarina xwe çêkir û xwar. Di wê berfa zivistanê de me dest bi manga kir. Em pîst û pênc hevalên keç bûn, hingî berf pir bû me tevan mangak çêkir û şûna yeka din jî me paqij kir. Wê rojê di wê mangê û di bin naylonê de me xew kir, heta li me bû sibeh em qerisîn, ji sibehê de agir dadan û me xwe gerim kir. Piştî xwarinê me dest bi karê xwe kir, me şûna du mangan ji berfê paqij kir û dar birîn ji bo magan, heta êvarî me her du mangên xwe çêkirin. Nêzî heyvekê em li wir man paşê me Newroza xwe pîroz kir, hevalên eyaletê li cem me bûn, piştî newrozê ji me re civîn çêkirin. Paşê me xwe amade kir ji bo em derbasî Geliyê Zapê bibin. Em li gundekî li Geliyê Zapê bûn. Hevalan bi rojbaşê re xwe amade kirin, tepeciyan agahî dan ku her der keşif kirine û tiştek tune ye. Em gurubek hevalên keç çûn banyo. Dema em vegeriya hevalan ji min re gotin tu nobeçî ye, gurubeke heval nan çêdikirin, hinek manga çaya wan hazir bibû û hinêk jî çaya wan li ser agir bû. Di dema xwarinê de ez çûm cihê nobeta xwe. Du hevalên keç li cihê nobetê bûn, ew daketin jêr ez li cihê nobetê mam. Deqak derbas bû dengê teqînekê hat, min nas kir ew teqîn ji cihê me hat. Min bala xwe daye ev ne tepeciyên me ne, ev dijmine û şûna tepeciyên me girtine. Jorî me tev dorpêç kirin û em xistin

çeperê, min dît şer li ser dolê ye, ez çi bikim divê ez bighêm cem hevalên dolê, min di rêyekê re xwe berneda dolê û ez daketim, mermî di ser min re di teqiyan. Ez daketim dolê kesek tune ye, ji bilî her du hevalên keç yên ji nobetê daketibûn. Min ji wan re got kanîn heval, di ku re çûn. Ji min re gotin, dol û dol çûne. Min ji wan re jî got, ka em jî herin û xwe bighînin hevalan ji ber dijmin hawin davêjin dolê. Di ser serê me re teqereq fîşekan û hawinên dijmin dihatin li ber me diketin, teht û kevir tev bi ser serê me de dihatin xwarê. Me xwe xelas kir, ji nûqtê dol û dol em çûn heya em gihiştin hevalan. Hevalek şehîd ket û ew li wir veşartin, sêzdeh heval jî birîndar bûn. Gurûpek heval li tepe bi cih bûn û gurûpek din çûn pêşiya dijmin bigirin, em hevalên din jî man di dawiya dolê de. Hevalan gotin berî balafir werin, em xwe ji vê dolê xelas kin. Destpêkê me hevalên birîndar xelas kirin û piştire hevalên din jî xelas bûn, teht û teht em derbas bûn. Em hinekî bi jor ve çûn, me dît ku firokên dijmin hatin. Hevalan gotin tek tek bin, xwe bavêjin erdê û qet nelivin. Em tev di cihê xwe de heta êvarê sekinîn. Piştî dunya tarî bû em ketin tevgerê, wê şevê di nav tehtan re em çûn. Nalenala hevalên birîndar bûn, dêşiyan û hingî xwîna wan çûbû tî bûbûn. Em wê şevê gihan gundek xerab e, hevalan gotin avê vexwin û em ê bimeşin. Bi destê sibê re me xwe gihand nuqtakê û heya êvarî em li wir man. Bi şevê em çûn gundê Şkestûnê, hefteyekê em li wir man paşê hevalên ji me qut bûn gihan me. Em bi hev re çûn nûqteyek dîn, li wir hevalan textor anîn birîndar tev derman kirin, hinek hevalên birînên wan giran bûn ew şandin cihekî din. Paşê heval tev gihaştin hev.

## Em Li Geliyê Zapê Bûn

Em li Geliyê Zapê bûn, hevalan amadehiya operesiyoneke leşkerî dikirin. Gurûpên ku biçin operesyonê derxistin, ez jî di nav wan de bûm. Bi êvarê re em bi rê ketin, heta destê sibehê em gihaştin cihê operesyonê. Gerek bû em hefteyekê bimînin. Me navberek dayê, em razan paşê em xwarin xwar. Piştî xwarinê em kom bûn û li ser pilanê em sekinîn. Êvarî em çûn ser rê, du hevalên xort çûn nobetê li pêşiyê. Paşê gurûpa êrîşê der xistin, Dûra gurûpa parastinê derxistin û ez di gurûpa parastinê de bûm. Hevalan bombe li ser li pêşiya leşkeran danîn, ji bo dema derbas bibin di wan de biteqe û em jî li wan bidin. Hemû hevalan cihê xwe girtin, em tev ketin mewziyan. Me dît carekê teqîn ji aliyê nobeçiyên me ve hat. Hevalan ji nobetçîya pirsîn çi bû, got leşger hatin. Me çiqasî guhdar kir tiştek tune bû. Hevalan biryar dan em xwe bikişînin ji ber ku operesiyona me xera bû, divê em zû xwe bigihînin cihê saxlem. Me xwe paş vekişand û em wê şevê jî meşiya, heta destê sibehê em gihan bêlûkê. Em gihan bêlûkê hevalan pirsî çi çêbû, ji ber divê em hefteyekê bimana, me got operesiyona mexera bû. Hevalan gotin bera du hevalên keç cîhaz bibin ji tepeçiyan re berî dijmin derkeve. Du hevalên keç xwe amade kirin cîhaz girtin û çûn tepe. Hîn di rê de bûn dijmin derket, duwazdeh hilîkopter hatin ser me, her du hevalên keç di rê de bû û xwe di nav av û tehtan de veşartin. Dijmin li wî aliyê avê bû û her du hevalên me li vî aliyê avê bû. Çar hevalên keç tepecî bûn û bê cîhaz bûn. Tepeciyan li dijmin dan ji bo hevalên bêlûkê xwe xelas bikin. Bêlûk jî ket tevgerê ji bo xwe biparêze. Dijmin bi hilîkopteran lêdida, me xwe paş

vekişand, tek tek me xwe gihand dolê. Gurûpek heval derketin ji bo parastina hevalan di dolê de bikin, tepecî man li cihê xwe şer dikirin. Dijmin dora me tev dorpêç kir. Hevalan got bila gurûpek hevalên xort bi tehtan ve hilkişin, gurûpa hevalên xort bi tehtan ve hilkişiyan, li wir di nav tehtan de man. Em pîst û pênc heval tev çûn nêzî şkeftekê bûn. Divê heval têkevin şkeftê ji ber dora me tev girtine. Devê şkeftê pir teng bû, em yek yek bi zorê tê re derbas bûn. Em tev ketîn hundirê şkeftê. Min û hevalekê me şopa nigên xwe xera kir. Deriyê wê şkeftê di aliyekî din de jî hebû, hevalan di deriyê paşî re dijmin di şopandin. Ji seat neh heta êvarî em di hundirê şkehtê de man, şkeft pir tarî, teng û pir dirêj û zirav bû. Heta êvarî me nizanîbû çi li derve çêbûye. Dema em dişkeftê de bû, me digot nuha wê dijmin were. leşgerên dijmin hatin dolê li me digeriyan û dengên wan di hatin hevalan, hevalên me li wan guhdar dikirin. Fermandarek û leşgerek wan hatin ber deriyê şkeftê, yê leşger got apoçî divê şkeftê de ne, fermandar got hema apoçî di vê şkeftê de bin jî bila tê de bin, em îşê xwe ji wan naynin û ji ber deriyê şkeftê vegeriyan. Heger bixwestana tiştekî bi me bikirana, karîbûn bombak bavêtana şkeftê, lê îşê xwe ji me nanîn. Em bîst û pênc heval bûn, nizanim çi rehme ketibû dilê wî fermandarî. Bi rastî heger tiştek bûba wê komkojî ba. Ber êvarê hevalan gotin werin derkevin, heval tev kom bûn û me bawer nedikir ku em hev du bibînin. Me xwe amade kir ji bo em bi rê kevin, em meşiyan heta nîvê şevê. Heval tev westiya, tî û birçî bûbûn ji ber du rojan me tiştek nexwaribû. Bi destê sibehê re em gihan Guzêreşê û me wê derbas kir. Em çûn jor di nav tehtan de me bêhna xwe vekir, me dît carekê milîtan bang me kir û got heval dijmin di Guzêreşê de ye zû em xwe xelas

kin, hevala bi rê bikin. Em tev rabûn û ketin tevgerê, dijmin top û hawin avêtin me. Em bûn du gurûp, gurûpek çû bi aliyê tepê Garê ve, em gurûpa din jî çûn ser rê heya em gihiştin avê. Me bi lez xwe lêda, avê da heta qirika me, av pir xurt bû ji ber wê me tevan bi destên hev girtin. Hindik ma bû hevaleke keç li ber avê here, hevalekî xort ew girt û xelas kir. Me tevan bi zehmetiyeke mezin av derbas kir û em çûn ser rê dimeşiyan. Dijmin bi top û hawinan bi ser me de hatin. Di wê êrîşê de em tev ji hev qut bûn, me nizanîbû kî sax e kî şehîd e. Ber êvarê em nêzî nuqta xwe bûn, ji ber dijmin hawin û top davêtin, em hêdî hêdî di ber avê re û di nav daran re dimeşiyan. Firokên dijmin jî di ser me re diçûn û di hatin, lê bidiqet nizanîbûn em li ku ne, zanîbûn em di Alanê de ne, lê Alan fireh e nizanîn em li ku ne. Her wan lêdidan, tiştek bi me nedihat, lê cihê tepeciyan diqet kirin û çûn ser wan. Tepeciyan cihê xwe bernedan, li dijmin dan ji bo bêlûkê xelas bikin diqeta dijmin kişandin ser xwe. Dijmin bi hemû hêza xwe çû ser tepeciyan, çar hawêrdora tepe girtin, çar hevalên keç li tepe bûn. Hevalan di şer de heta dawî ber xwe dan, du hevalan xwe xelas kirin û her du hevalên din jî piştî fîşekên wan nema xwe avêtin himêza hev û bombên xwe bi xwe de teqandin xistin. Em jî sibehê heta êvarê di rê de man. Dema firokên dijmin dihatin me xwe davêt erdê û em ji binî de nediliviyan, dema firoke diçûn em dimeşiyan. Ber êvarê me xwe gihan nuqtakê, tev dar û dol bû nexuyanê bû. Em birçî bûn,me parîk nan û çayê xwar, wê êvarê em li wir man, cîhaz jî bi me re tune ye û em nizanin hevalên din li ku ne. Heta pîştî du rojan jî me kes nedît û em nizanbû ku her du heval şehîd ketine. rojekê nîvro deng bi hevalan ket, hevalan reşek li ber avê û di nav daran de dimeşiya

dîtin. Em li jor bûn bi dorbînê nêrîn dîtin ku heval Jiyan e, ya ku ji gurûpa tepeciyan xelas bûye. Hevalan bang kirin ew tirsiya û xwe veşart. Paşê qomîtana me, hevaleke keç û hevalekî xort çûn ew anîn. Dema hat nav hevalan pir kêfxweş bû, heval jî kêfxweş bûn. Me li rewşa hevalên din jî pirsî, heval Jiyan ji me re got ku heval Rîhan û heval Bêrîvan şehîd ketin û got em û dijmin ketin nav hev, Her du heval di mewziyekê de bûn, ez û heval Zîlan di mewziyekê din de bûn. Dijmin dema hat tepê, me her duwa xwe berda jêr, xwestin me bigirin, lê me xwe xelas kir, dîsa li pêşiya me zivirîn û em her du jî ji hev qut bûn. Ez zanim heval Zîlan şehîd bûye yan ketiye destên dijmin yan jî xelas bûye. Piştî hatina heval Jiyan bi du rojan, dijmin xwe paş vekişand. Heval çûn tepa ku heval lê şehîd ketin ji bo ku hevalan veşêrin. Cenazê heval Rîhan û haval Bêrîvan dîtin, wan kom kirin û veşartin û paşê çûn li heval Zîlan geriyan, lê ew nedîtin. Roja sêyan hêdî hedî hevalên ji me qut bûbûn dihatin û bêlûka me dîsa kom bû. Hevalan hevalên ku çûbûn cîhaz bibin ji tepeciyan re ew jî dîtin, her du heval xwe li ber avê û di nav tehtekê de xwe veşartibûn. Ew li vî milê avê bûn, dijmin jî li wî milê avê bû, heta êvarî di nav avê de mabûn. Êvarê ji nav avê derketin û xwe dan jora çiyê ser pişta gundekî xerab e, çûbûn ber şkeftekê û tê de du rojan xwe veşartibûn. Roja sêyan gurûpa hevalan û her du hevalên keç dîtin û anîn bêlûkê . Wê rojê heya êvarê bêlûke tev gihiştin hev, êvar bû em tev razan û nobetçî çûn nobetê. Bi rojbaşê re ez û hevalekê çûn nobetê, heta nobeta me xelas bû ku ez hatin ban nobeçiyan kim, hevalan jî min re gotin heval Zîlan jî hat. Min pir kêf kir. Zîlan jî ji hevala xwe qut bûbû û bi tena serê xwe sê rojan di tepê de mabû. Dema dijmin tê tepê ew xwe berdide jêr

û di bin tehtekê de xwe sê rojan vedişêre. Bê xwarin û vexwarin bi tena xwe dimîne, piştî sê rojan êvarê radibe û hêdî hêdî xwe berdide ber avê. Hinek av vexwar, paşê bomba xwe xist destê xwe û meşiya. Sê rojan, kete roja çaran bê av û xwarin û bê hêz bû. Ji êvarê heta rojbaşê dimeşiya û gihaşt ber nuqtê, li bin tehtekê xwe dirêj kiribû û li hêviya rojbaşê mabû. Bi sibehê re hevalan rojbaş kirin, heval Zîlan jî dengê hevalan bihîst û bi kêfxweşî rabû ser xwe û hat nav hevalan. Heval tev lê kom bûn, kêfa hevalan tevan hat û çîroka xwe ji me re got. Rojeke din jî em li wir man paşê em rabûn dîsa çûn piratîkê, bêlûk tev gihan hev, lê heval Rîhan û heval Bêrîvan tevlî kerwanên şehîdan bûn, ez bi wan pir bandor bûm.

## Ez li Çarçêla bûm

Dunya zivistan bû, em hemû hevalên bêlûkê çûn Eraqê, em rojekê meşiya û dunya mij, ba û bahoz bû, em di nav berfê de dimeşiyan. Em gihan Deryê Hirçê, em bi zorê meşiyan heta me zûqaqê derî derbas kir. Em gihan ser derî û me bêhna xwe veda, paşê me xwe berda jêr bayê cemidî dihat, em ji serma qefilîn. Em xwe şemitand heta ku em li jêr sekinîn, paşê me meşa xwe berdewam kir heta em gihiştin cihê erzaq. Hevalan agir li ser berfê dada bûn, me xwe gerim kir, paşê me barê xwe bar kir û em bi rê ketin. Me avrazî bi zorê derbaskir, em gihiştin ser Deriyê Hirçê û me xwe berda xwarê. Piştî nîro berf ji qeşa dihiliya. Em li ser dimeşiyan heta navê em di nav de diman, me bi destan nigê xwe ji nav berfê dikişand. Rêya seatekê me kir çar seat. Hêstirek bi me re bû. Bar kêm bû, ew jî di nav berfê de dima hingî zehmetî dikişand. Bi rê de xwe întîhar kir û mir. Di dawî de me barê hêstir jî rakir. Ew erzaq li ser hevalan bav kirin, bi zehmetiyên pir mezin em gihan nuqtê.

## Derketina Ji Zaxrosê Û Çûn Xinêrê

Hevalan bi me re nîqaş kirin, gotin gurûpek hevalên keç hûn ê biçin Xinêrê. Em şeş hevalên keç û du hevalên xort bûn û qoriya jî bi me re bûn, me xatir ji hevalan û Zaxrosê xwest. Em ji ber Avaşîn bi rê ketin û ji sibehê heta êvarê em meşiyan. Êvarê dunya tarî bûbû em gundê Satê derbas kir û em bi jor ketin. Di nîva dolê de cihê hevalan hebû, wê şevê em li nuqta hevalan sekinîn û li wr man. Bi serê sibehê re me roj baş kir. Em rabûn me tastê xwar, paşê em bi rê ketin û em di dola Deriyê Hirçê re çûn. Li Çarçêla Deriyê Hirçê derîkî asasî bû û li jorî gundê Satê bû, berê jî gundiyan ew derî bi kar tanîn û ew zûqaqa Deriyê Hirçê çêkiribûn. Di wî derî re bazarganiya xwe dikirin û diçûn gundan, heta bajarê Geverê diçûn. Hevalan jî ew derî pir bi kar tanîn, di nav jiyana me de ew derî tayîbet e. Em di dolê re zûqaq zûqaq meşiyan, heta em gihiştin Deriyê Hirçê û em li ser derî rûniştin. Me bîranînên xwe anîn bîra xwe ku me çi li Zaxrosê jiyan kiriye, paşê em rabû çûn ser gola Çarçêla. Gola mezin ya ku pirê caran me û bi sedên hevalan tê de melevanî kiriye, me gol jî derbas kir. Em çû nûqta hingivîn cem hevalan, me bêhina xwe vekir û xwarin xwar bi êvarê re em bi rê ketin. Em meşiyan heta gihan gundekî û me veşartî veşartî çûn malekê, em hinekî rûniştin û malê çayê û xwarin dan me, paşê em bi rê ketin ji ber ku divê em zû biçin cihekî saxlem. Wê şevê tev em meşiyan, bi şeveqê re em gihan gundekî din, wê şeveqê gundî radibûn pezê xwe diçêrandin. Em li jorî gund bûn û dengên gundiyan di hatin me. Şeveqê hîn dunya tarî bû, me di nav erazî û tumikên gihan de xwe veşartibû, tumikên gihan mezin bûn wekî darên tirî bûn.

Ji serê sibehê heta êvarî em di nav tumikan de man, me nikarîbû xwe bilivanda û ji sibehê heta êvarê em dirêj kirîbûn. Êvarî em rabû û meşiyan heta em gihan newalekê, me bêhina xwe vekir û paşê di nav tepe û tehtan re em meşiyan heta em gihiştin cihê xeterê. Em gihiştin gundekî qereqol tê de bû, enzeloka debabê tê de bûn, em bê deng û rûniştî meşiyan heta me gund derbas kir. Em ketin paş gund û qederekê meşiyan heta em gihaştin deşta Geverê. Tev zad û genim bûn, av heta qirikê bû. Qoriyan ji me re got divê hûn xweş bimeşin, ji bo em vê avê û deştê derbas kin. Ev cîhekî xeter e, me da nav avê û erda kelekort bû, em di nav avê de qederekî meşiyan. Diva bû ku em lez bikin ji ber cih xeter bû, em di nav avê de gelek caran diketin û diçûn bin avê, em radibûn û dîsa dimeşiyan. Em du saetan meşiyan heta em avê xelas kir, dema me av xelas kir bakî sar dihat û em ji serma qefilîn. Bi nîvê şevê re dîsa em qedereke meşiyan heta em nêzî gundekî bûn, du heval li pêşiya me çûn gund ji me re nan bînin. Em qederekê man ew heval ne hatin, hevalekî got li vir bin heta ez herim wan bînim. Ew heval çû paşê hat û got meşin malekê ji me re xwarin hazir kiriye, em tev çûn malê ji me re sopa ardû dadabûn. Em tev şil bûn di rê de jî me xwe di erdê dabû, cilên me tev toz û herî bûn. Dayîkê got hûn tev zarokên me ne, werin xwe gerim bikin, bila hûn herî bin jî hûn ê werin ser cilikan û xwe zuha bikin, çayekê vexwin û parîk nan bixwin, paşê hûn ê herin. Em çûn hundir me xwe germ kir, em zuha bûn û me xwarin xwar, bi şeveqê re em ji gund derketin. Em qederekê meşiyan heta em gihan nûqta hevalan, me li wir navber da û razan heta piştî nîvro, piştî em rabûn ew çayê, nan û penêrê ku dayîkê dabû me, me xwar. Piştî me xwarin xwar me çaydanê

wan danî cihê her carê heval lê vedişêrîn û em li wir man heta êvarê, ber bi êvarê re em bi rê ketin. Wê şevê dîsa em meşiyan heta nîvê şevê em gihaştin berfeke hişk hemû wekî sîxan bû. Her me gavek davêt em dişemitîn ji ber wê em sekinîn, me hew karîbû bimeşiyana. Hevalên qoriya rê vekirin heta em meşiyan. Hevaleke me di xîzê de şemitî dolê, li cihkî sekinî û heval çûn ew anîn. Bi zehmetiyeke pir mezin me ji wê berfê xelas bûn û em gihan boxazekê, boxaza aliyê Şehîda bû. Em gihiştin milê Şehîd, heta nîvro em meşiyan heya gihan cem hevalan, me bêhna xwe veda. Paşê dîsa heta êvarê meşiyan em gihan qerargehê, em li qerargeha Şehîda hefteyekê man. Paşê hevalan gotin hûn ê herin Xinêrê. Di rê de em li ser gundekî qedera seatekê sekinîn, me dît qelabak hat em ketênê û çûn Xinêrê. Bi destê sibê re em gihan nîzamiyê hevalan, em qederekê li cem hevalan man û ji me re gotin herin terzîxanê. Em çûn terzîxanê, em li wir jî hinekî man û ji me re gotin herin locstîkê û em çûn. Sê rojan em li wir man heta heval hatin, me dîtin û bi me re nîqaş kirin. Em çûn perwerdeya kadroyetê, ez heyvekê li perwerdeya kadroyetê mam.

## Xewna Şevê û Bîranînên Li Çiyê
## Ez Li Xinêrê Li Pajkê Bûm

27`ê Adara 2002`yan, min serokatî di xewna xwe de dît. Em gurûpek hevalên keç bûn, serokatî li cem me li çiyê bû li me dinêrî û dest bi civîna xwe kir. Li ser 8`ê Adarê roja cejna jinê civîn ji me re çêkir nîqaşên serokatî li ser rola jinê û giringiya wê di dîrok û di dema niha bû, paşê bang min kir û got ji rêveberiya xwe re bêjin ji bo hevalên keç sê xalên bingehîn hene bera di perwerda xwe de li ser bisekinin û di nav xebatên xwe de pêk bînin. Di xwenê de ji min re ew sê xal bi nav kirin. Ez ji xew şiyar bûm min serokatî nedît. Heval tev di xew de ne. Ez wê rojê ranezam. Min navên wan her sê xalan ji bîr kirin. Ez çiqas fikirîm nehatin bîra min. Bi roj başê re min xewna xwe ji hemû hevalan re got. Kesî nikarîbû şirove bike min xewna xwe nivîsand

28`ê Adarê 2002 Xinêrê   Dîrok dilovan

## Ji Perwerdeya Kadroyê Ez Çûm Qerargehê

Me heyvekê pewerde nedî, hevalan ez birim qerargehê û du heyvan ez li wir mam ferza me çêbû, ez dîsa çûm perwerdeya kadroyê. Me qampên xwe yê zivistanî heyvekê çêkirin. Me du heyvan perwerde dît, di nîvê zivistanê de em belav kirin û nehiştin em perwerdeya xwe temam bikin. ferza me çêkirin, bêlûkên hevalên keç û xort çêkirin ji bo biçin Şehîda. Ez jî çûm wê bêlûkê sê - çar heyvan man. Di dawî de dîsa em neçûn milê Şehîda. Dîsa ferza min çêbû, ez çûm ji bo xebata meydanê. Me amadekariya xwe dikir ji bo em herin xebatê, lê dîsa ferza me çêkirin û ez çûm locistîkê. Ez du heyvan li locistîkê mam, me bexçe çiqasî xweş çêkiribû, dîsa ferza min çêkirin. Vê carê ez çûm qerargehê, li qerargehê me mangên xwe yên zivistanê çêkirin, heta me mangên xwe yên zivistanê xelas kirin careke din ferza min çêbû. Ez çûm perwerda PJA` yê li Xinêrê, ji xwe ev ferzên min tev di Xinêrê de çêdibû. Wê zivistanê ez li perwerdeya PJA yê mam. Cara yekê bû ku ez di nav jinan de perwerdê dibînin, ev jî xwestekeke min bû. Ji xwe min rapora xwe li ser vî asasî ji qerargehê re şandibû. Perwerde tev jin û keç bû, dema min li wan û li bernameya perwerdê dinêrî, ez derbasî dunyak din dibû. Di perwerdê de hevalên keç parênameuya serokatî werger dikirin, semîner didan û civînên xwe li dar dixistin û di bêhin vedanê de lîsk û govend digirtin. Her rojek ji bo min çiqas xweş bû, min di got jin roj bi roj vedibe û jîn dibe. Ez pirê caran difikirim ku jin kaniya jiyanê ye, jin jiyanê dafirîne û rengê jinê rengê jiyanê ye. Dema serokatî di parêznameya xwe de li ser jin vedikir ez di nav de winda dibûm û timî min digot divê ez jinê lêkolîn bikim.

Divê ez di felsefeya serokatî de kur bibim heta ku ez jinê fam bikim. Timî ez di navbera xwe de di nav şerekî mezin de bûm. Min timî dixwend û bi hevalan re nîqaş dikir, lê dîsa jî ez li xwe vedigeriyam û min digot lêkolîn gereke. Ez dibêjim qeyî di wê perwerdê de min asta jinê hinkî fam kir. Parêznameyên serokatî giran bûn, mejiyê hemû hevalan li bin guhê hev diket, ez jî yek ji wan bûm. Serokatî bi rengekî felsefî, zanistî û siyasî mijaran vedike û dîroka cîhanê lêkolîn dike. Ji dema nolotîkî heta dema niha vedike. Mirov, xweza û lawran bi rengekî kur vedike û li ser jiyanê bi hemû rê, rêbaz û nirxên xwe, ji destpêkirin heta bi dawîkirina jiyan vedike û şirove dike

## Çûna Qendîlê

Wê zivistanê ez li perwerda PJA de mam. Bi rastî dewra me pir xurt bû. Di dawiya perwerdê de ferzê me çêbû ez dîsa çûm locistîkê, ez deh rojan li locistîkê mam, paşê min şandin PJA yê û qampa me ji Xinêrê çû Qendîlê. Em sê rojan meşiyan heta em gihiştin Qendîlê. Em çûn qampa şehîd Harûn ew jî cihê hevalan kevin bûn. Me ji xwe re mange paqij kir, hevalan amadekariya kongirê PJA yê dikirin. Kongirê PJA dest pêkir. Tev hevalên jin bû. Ev cara yekê bû ku gel jî tevlî bûbûn, cara yekê bû ku gel tevlî cîvîneke wiha mezin û ewqas hevalên keç, gêrîla û çiya dibînin, ji ber vê jî moralên wan pir bilind bûn, ji min re jî ev cara yekê bû ku ez tevlî konfirasa PJA yê ya sêyan bûm. Dema ku ez tevlî kongira PJA yê ya çaramîn bûm, moralê min pir bilind bû. Min di navbêra xwe de digot, Di nav PKK`ê de jin di aliyê fikrî de li pêş e, jin felsefak bi serê xwe ye. Serok dibêje divê jin azad bibe, heta jin azad nebe civak azad nabe, jin felsefa jiyanê ye, jin îdyolojiyek bi serê xwe ye. Ez di fikirê xwe de diketim şerekî pir mezin, min dît ku ez nuqtak ji felsefa PJA û PKK`ê me. Di kongir de di aliyê rêxistinî û jin di siyasî, dîrokî û di felsefî de gihaştiye çi astê hat nîqaş kirin û li ser rexne û renedayin û kêmasiyan sekinîn de pir li pêşbû. Kêmasî di kûde têne dîtin. Li ser dihate sekinan. Hîn kongir xelas nebibû ji ber ku du rojan berdewam bû, ji min re hat gotin heval Gûlan şehîd ket. Şehadeta heval Gûlan bandoreke pir mezin li ser kongir kir û sekinî, piştî du rojan kongir dîsa dest pê kir û du rojên din dirêj kir. Piştî heyvekê ferza me çêbû û ez li rojavayê Kurdistanê ketim. Ji şehîd Harûn em çûn dola Kokê. Deh rojan em li wir

asê man. Paşê dîsa em vegeriyan, em gurûpek heval sê heyvan li qerargehê man. Me parêznameyê ku nû wergerî erebî bûbû dixwend. Piştî sê heyvan em bi rê ketin û çûn Mexmûrê, em heft rojan li Mexmûrê man paşê em derbasî rojavayê Kurdistanê bûn.

# Ez Hatim Rojavayê Kurdistanê



Ez hatim rojavayê kurdistanê, li Şam û Reqayê min xebatên rêxistinî dimeşand. Xebata min bi jinan re bûn. Wê demê di nav partiyê de tevlihevî hebû, dema wê firtonê bû. Di nav xebata me de jî kêmasî pir xwe didan pêş, lê me nizanîbû di asta jorê de çi heye. Tiştê me derdixist ferqê, me digot tiştin hene wê biteqin.

## Vegera Min Li Çiyê

Ez dîsa çûm çiyê, me amadekirina kongira yekîtiya ST dikir. Kongirê YS dest pêkir, em tev hevalên jin bûn. Zahmetî hebûn û ji gel jin di kongirê de tune bû. Kongira yekemîn bû. Ev kongir bi navê rêxistinê xwe topî ser hev kirinbû. Pir tiştên asasî hatin ser ziman, ew muhra jinê di aliyê rêxistinî de çê bibûn, kêmasiyên kesayetî û rexne û rexnedayîn bi nîqaşên berfireh hatin ser ziman. Di kongir de rihetbûna wijdanî çêbû û bi moraleke xweş kongir bi dawî bû. Kêmasiyên asasî ku ji gel jin di kongirê de tune bûn. Piştî kongirê YS kongira PYD`ê çêbû. Ewqas tevliheviya ku li çiyê û li rojavayê kurdistanê çêbibû. Tiştê herî baş ku ji gel jin û zilam jî tevlî kongirê bûbûn, di aliyê kesî de sekinandineke dijwar çêbû. Ew kesayetên çewt tev hatin mahkûmkirin, nepêşxistina rêxistinî li ser hat sekinandin, kêmasiyên giştî tev hatin ser ziman, ew kesên teslîmkar û reviyan ji nav rêxistinê hatin mahkûmkirin. Tiştê herî xweş ku gel tevlî nîqaşan dibûn, ji ber gel kêmasiyên pir tanîn ser ziman. Bi rastî kongireke xweş hat meşandin. Piştî kongir bi dawî bû hevalan amadehiya perwerdê kirin. Wê demê partiyê amadekirina kongira gel dikirin. Ez çûm tevlî kongirê gel yê sêyemîn bûm. Di kongir de aliyê siyasî, civakî, rêxstinî û xebat tev hatin ser ziman, kesayetên kadro çawa tên avakirin, li ser şaştî û kêmasiyan hat sekinandin û em ê çawa di xeta serokatî de bimeşin û barê wî sivik bikin. Kongir ji bo min tecrûbe û perwerdeyeke pir mezin bû. Min fam kir ku ez di felsefa serok APO û PKK`ê de pir kêm û lawazim. Piştî bîst û du rojan kongirê bi dawî bû. Di dawî de hevalan moral girtin û pir xweş derbas bû. Ez dîsa vegeriyam qerargehê, min pêşniyar kir ku ez biçim

perwerdeya PKK`ê ya herî bilind bibînim. Di despêkê de ji min re gotin tê here, ez û hevaleke din bû, piştî pênc heyvan pang me kirin, em çûn. Di nîvê rê de em vegerandin, ji me re gotin we qebûl nekirine. Şkandinek di kesê min de çêbû, min di nava xwe de got qey ez ne kadirokî PKK`ê me. Hevalên qampê pir bi me re nîqaş kirin, lê min digot ez jî kadirokî  PKK`ê me, dîsa ez li xwe vedigeriyam û min digot qey min taybetmendiyên PKK´ê yên herî bilind di kesê xwe de ava nekirine. Demekê ez û fikirê xwe di nav şer û pevçûnekê de jiyan dikir. Min û wê hevalê pêşniyar kir em herin qomîta ziman. Em çûn perwerda zimanê kurdî û sê heyvan li perwerdê man, em fêrî zimanê kurdî bûn. Piştî sê heyvan em vegeriyan qampê, paşê ew heval çû rojavayê Kurdistanê. Ez nûnera kongira gel bûm, ez li qampê mam heta kongir dest pê kir. Kongira çaremîn bû. Vê carê pir dirêj nekir kongirekî baş derbas bû û pênc rojan dirêj kir. Me di nîvî de cihê xwe guhert, ji ber wê demê rewşa oprasiyona li Xinêrê sê heval şehîd ketin. Hevalan gotin divê piraniya me di kongirê de amade bibin. Me kongir li cihekî din dewam kir û piştî du rojan kongir bi dawî bû. Ez dîsa vegeriyam qampê heyvekê li wir mam. Paşê ez hatim rojavayê kurdistanê, em gurupek çûn Xinêrê Îdarê, em hefteyekê li Îdarê man. Paşê em çûn Zapê, em li wir sê rojan man. Paşê em çûn Garê,  li Garê bîst rojan man. Paşê em derbasî rojavayê kurdistanê bûn.

## Cara Duwem Ez Vegeriyam Rojava

Me keştiyên xwe amade kirin, du keştî me bi heve girêdan û çentên xwe avêtin yekê, du hevalên din jî li keştiya din siwar bûn. Me xwe berda ava mezin, seat dehê şevê me ava mezin xelas kir. Me keştiyê xwe veşartin û em bi rê ketin, em meşiyan heta ber destê sibehê em gihiştin gundekî. Heval hatin pêşiya me, me birin gund. Seat dehê sibehê  em çûn Qamişlo, em li cihekî sekinîn heta heval hatin cem me. Paşê ez çûm Helebê, ez salekê û du heyvan li wir mam. Paşê ez çûm Dêrikê. Demeke dirêj ez li Dêrikê mam. Ez bi nexweşiyeke giran ketim, lê min kar jî dikir. Ez him dêşiyam, him jî min kar dimeşand.

## Bi Kurtasî Ş. Dîrok Li Ser jiyana Xwe Bi Rêz Kiriye

- Ez di sala 1991 `ê de tevlî partiyê bûm, min kar li Amûdê û gundên derdora wê kiriye û di sala 1994`an de ez çûm perwerdeya serokatî li Şamê, heft heyvan li wir mam.
- Di sala 1995`an de serok ez şandim xebatê li Efrînê û di sala 1996`an de ez çû Kobanê li wir ez di 10. 6. 1996`an de hatim girtin.
- Ez salekê di zindana firhê Filestîn de mam.
- Di 1.7.1997`an de ez çûm qampa kurdî, li wir ez neh heyvan li qampê mam.
- Di 5.4.1998 `an de ez derbasî çiyê bûm, ez çûm Zaxrosê li Herkê, çarçêla, çîlo û Geliyê Zapê mame û geriyame, paşê ez çûm Xinirê û Qendîlê.
- Di 2003`an de ez derbasî Rojavayê Kurdistanê bûm, li Şam û Reqayê mam.
- Di 1.1. 2005´an de ez dîsa çûm çiyê û di 30. 6.2006´an de dîsa vegeriyam Rojavayê Kurdistanê, li Heleb û Dêrikê mam.

## Gotinên Ş. Dîrok Yên Dawiyê Berî Şehadetê Bi Hefteyekê

Hêvî û baweriya min jixwe heta dawî bi fikir û ramanên serok APO heye û ji bo Rojhilata Navîn û dunyayê tevî jî Kurdistan kilît e. Min di vê rewşê de parêznameyên serokatî xwendin, lê mêjiyên min pir nedikişand. Di pirtûkan de serokatî behsa guhertina Rojhilata Navîn dike û bandoreke çawa bike tê de şirove dike û di hemû tehlîlên wî de pêk tên, jixwe ji bo me hêviyeke nû ye, him ji bo Kurdistanê û him jî ji bo Rojhilata navîn, bi taybet rola jinê û ciwanan nû dike, em nikarin bê ramanên serok tu guhertin û pêşketinan çêkin. Jixwe dema PKK`ê derket tevgereke bê şer bû û heya roja îro jî serok dibêje em dikarin vê dozê di rêya siyasî, civakî, ilmî û felsefî çareser bikin û ji bo gihaştin û famkirinê divê em bixwînin. Rast e hin tişt hene heta niha em tênegihaştine, lê pir tişt jî me fam kirine. Ez pir dixwazim bixwînim, lê mixabin ez di vê rewşê de û bi taybet di çar salên dawê de, di pir tiştan de zorleme dibûm û min nikarîbû li gorî dihat xwestin tev bigeriyama, pir kêmasiyên min derdiketin û ez tim di aliyê derûnî de di nav şer de bûm û wijdanê min, min pir dêşand.

## Gotina Ş. Dîrok Ji Bo Xwendevana

- li min biborînin. Ez nizanim min ev pirtûk çawa nivîsandiye. Di destpêkê de li ser malbat û taybetmendiya malbatê nivîsandiye. Belkî min pir aliyên wê vekiriye, dibe ku negerek bû jî ez ewqasî vekim, lê min vekir.
- Dîsa min li ser kesê xwe vekiriye, ji zaroktiya xwe heta nexweşî li min peyda bû. Ji zaroktiya min heta ez mezin bûm ez çawa bûm. Dema min partî nas kir û min biryara xwe da û di nav partî û PKK`ê jiyana min derbas kiriye û çawa bû, min ew nîvîsandiye.
- Belkî ez neketime nava taybetmendiyê xwe. Dîsa tevî hemû kêmasiyên min yên derketin min kêm vekirinû hin tiştên di jiyana min de di nav partiyê de derbas bûye min ew nivisîn. Ez di xwazim hîn binivîsim û pir tiştan vekim, lê nizanim niha nayên bîra min. Ji ber fikirên min hinekî kêm bûye, ez tiştan zû ji bîr dikim. Min li ser her du birayên xwe yên şehîd nivîsandiye.
- Belkî nivîsandinên min neyên fam kirin, ji ber xeta min negelekî xweşk e. Belkî hinek tîpên wê kêm bin, ew jî dema min dinîvisand ez di nav de winda dibûm.
- Ez dizanim kêmasiyên min pir in, hûn ê bi xeta min û nivîsandina min re biwestin.
- Dîsa şewazê nivîsê min nizanîbû. Ev cara yekê ye ez dinivîsim, min hevok û mijar nivîsine, lê xal, kevanek, bêhnok, xalbemd, lêpirs, xêz û hwd min nizanîbû bê li ku tên danîn.
- Ji vê zêdetir hew min karîbû. Min biborînin.

Dîrok Dilovan Silav û Rêz

# Ez Kîm e

Tu dipirsî ka ez kîm e?

Ez im kurd im kurdistan im.
Ez im pêt im ez im Ar im.
Ez im lat im ez zinar im.
Li ser welat ez dinalim.

Ez im teyr im ez teyar im.
Ez im gul im gulîstan im.
Ez Botan im ez Deyax im.
Ez Zaxros im Dilovan im.

Ez dayîk im birîndar im.
Ez şalul im ez dinalim.
Ez leheng im ez egîd im.
Ez şehîd im ez omîd im.

Ez im berf im ez baran im.
Ez payiz im zivistan im.
Ez havîn im ez buhar im.
Ez im jîn im ez jiyan im.

Ez roman im dîrokvan im.
Ez Rîhan im xwendevan im.
Ez Zîlan im şehristan im.
Ez şagirta Ocelan im.

***Dîrok Dilovan 10 .12. 2009***

## Welatê Min

Welatê min tu şêrîn î.
Wek çîçeka bi bîn î.
Keç û xortê bi hêvîn e.
Pkk ê xweş mizgîn e.

Va ye gelên me tev rabûne.
Yekîtiya xwe danîne.
Ji bo welat şehîd bûne.
Ta ku kurdistanê bistîne.

Va ye rabûye serokê gelan e.
Serok Ebdulah Ocalan e.
Ew ê ku dunya tev hejande.
PKK`ê şaxê xwe daxist herderan e.

***Dîrok Dilovan 17-18`ê Gulanê***
***1997`an pîrozkirina cejna şehîdan***
***di hundirê zindanê de em pîroz dikin***

## Şehîd Dilovan

Tîrêjê çavên te weke teyrê hur bû.
Doza te ji bo jiyanek nuh bû.
Soza te da şehîda sozek ji dil bû.
Rext û tiving li bejin û bala te çiqas xweşk bû.
Şerê rûbarekê şerekî xedar bû.
Dijmin û xayin tê de xefk vedabû.
Li himber wî şerê han tu qehreman bû.
Bi berxwedanek mezin tu tevlî kerwanê şehîdan bû.
Rê heval Dilovan tu qomîtan bû.
Tirsa te di dilê dijmin de şax vedabû.
Şehîd taca serê gelan bû.
Bi rêberiya serok Ebdula Ocalan bû
Di roja 17-18/5/1997 pirozkirina cejna
şehîda di hundirê zindanê de em pîroz dikin.

***Dîrok Dilovan***

رسالة
ديروك

بسم السلام والديمقراطية

إلى جميع العوائل الوطنية والى عائلتي المحترمة.

قبل أن أبدأ بكتابة رسالتي هذه أبعث بتحياتي واحتراماتي اليكم جميعاً وبقلب واسع وحب وشوق كبيرين......

أننا هنا نعيش على هذه الساحة الساخنة وبصحة جيدة وعافية

وكما نبعث جميع الرفاق والرفيقات أحر وأعز تحيات إلى جميع العوائل الشهداء والوطنيين والمؤيدين.. وانتم تعرفون جيداً التطورات الحاصلة على الساحة الكردستانية والعالمية وخاصة بعد اعتقال قيادة الحزب والذي قد وضع النهج الاستراتيجي الجديد الا وهو مرحلة السلام والديمقراطية وتحت اليوم نسير على هذا النهج في كل خطوة نخطوها.

فكلما كانت لنا نهج خلق العمليات العسكرية سواء الانفجارات أو غير ذلك من العمليات ضد الامبريالية والفاشية وقوا عدوهم جميع مراحل الحرب والدبلوماسية والسياسية والاجتماعية والعسكرية)

وهذا فقد وصلنا إلى هذه المرحلة والتي نعيشها اليوم وهو مرحلة وقف إطلاق النار والنداء بنهج السلام والديمقراطية. وهذا ليس مهمة الكريلا فقط وانما هو من مهامكم أيضاً فلا استطيع أن أعبر او الحق

ما يجول في داخلي من احاسيس وشعور نتيجة الفقدان الذي نتج من انفجارات البراكين العظيمة والبطولية وكان هذا بفضل جهود القائد والعظماء الذين فجروا اجسادهم من امثال الرفيقات زيلان - بريوار - روشن - سما - فلات وعالف وغيرهم.

بالاضافة إلى ذلك ومن التطورات الجديدة وهو عقد المؤتمر الثالث للمرأة والتي تم تحت اشراف القائد وقد انتهى بنجاح كبير وادخل السعادة

Subject: Date: / /

إلى تقوى جميع الرفاق والرفيقات وهذا ما أعطى الثقة والإيمان
بأن تكون جوابًا للمرحلة التي حققها القيادة وأن يكونوا طليعات
لهذه الثورة، ثورة الشعب والديمقراطية كما كانت سابقًا قبل عشرات
السنين في مرحلة خلق الإنسان والتي كانت خلاقة وسيادة لأن
المرحلة بدأت بالمرأة ويجب أن تنتهي بالمرأة أيضًا لذا فقد ألقى
القيادة هذه المهمة على عاتق النساء وهذا ما يطلب من جميع النساء
الكردستانية بأن هذا الحمل ليكونوا الصوت والسند وأعطاها دعوتًا
لأداء الجميع الذين روادها على هذه الساحة نحو الحرية والاستقلال.

أما بالنسبة لأوضاعي الشخصية فقبل كل شيء. المعذرة لعدم مراسلتكم
حتى الآن أي منذ دخولي لساحة الوطن فكما تعرفون دخلت ساحة
الوطن عام ١٩٩٢ ومباشرة إلى ايالة زاغروس كادرها ميدانيًا عسكريًا.
كلي زاب II وبقيت هناك ومن بعدها جئنا إلى جزيرة المقر العسكري
لـ PKK. فكما تعرفون بعد تمدد فتاحين سوريا تم خروج القائد
إلى روما ومن بعدها تم الفاجعة التاريخية ألا وهو اعتقال القائد
وقد عشنا مرحلة حساسة جدًا أكثر من جميع المراحل بسبب هجمات
العدو رغم وقف إطلاق النار إلا أنه مع الخطوة التي خطاها قائدنا
تم تقصيها بشدة وسيرة هذه الحرب قد تجاوزنا مرحلة التوتر أما
أوضاعي جيدة وأتمتع بصحة وعافية ولا ينقصنا شيء سوى أن
نكلل هذا النضال والجهود بالانتصارات والعيش مع القيادة
في وطن ديمقراطي. وكي نوصلها الثقة ببناء ونبذل جهودنا ونسير

Al Abrash

Navê rastî: Şêxa Mihemed

Navê tevgerî : Dîrok Dilovan

Navê bav: Ebdilqadir Mihemed

Navê dê: Merdiya Hisên

Cih û dîroka ji dayîkbûnê: Amûdê , gundê Til Xenzîr di 5. 6. 1965 `an de

Dîroka tevlîbûnê: 1991

Dîroka tevlîbûna têkoşîna çekdariyê: 7. 1997

Cih û dîroka şehadetê: 20. 10. 2013 li Şamê bi nexweşiya penceşêrê

Cih û dîroka binaxkirinê: 23. 10. 2013 li amûdê.




LAKERS